

Bilaga på svenska

Berbang


KOVARA FEDERASYONA KOMELEYEN KÚRDISTANE LI SWEDE • HEJMAR No: 119 • SIBAT/FEBRUARI 2001



**Kurdiska frågan
måste vara ett konkret krav
för Turkiets EU medlemskap
på bilaga**

Hej taksi!

Rûpel: 12-15



Armancên



Federasyonê

F K K S rêxistineke demokratik e. Bi tu rêxistinên siyasî û olî ve ne grêdayi ye. Ji komele û yekîtiyên Kurd li Swêdê pêk tê.

- Kurdên li Swêdê temsîl dike û ji bo berjewendiya civata Kurd li Swêdê xebatê dike.
- Kurdên li Swêdê di derheqa civata Swêdê de agahdar dike û ji bo çareserkirina pirs û pirsegirêkên Kurdên li Swêdê û ji bo pirsra integrasyonê xebatê dike.
- Ji bo pêşdebirina ziman û belavkirina çanda Kurdî xebatê dike.
- Ji bo çareserkirina pirsên jin û ciwan û zarok û handîkapên Kurd xebatê dike û ji bo pêşdebirina wan hewildide ku îmkanan amade bike.
- Alîkariya penaberên Kurd dike û wan di derheqa mafên penaberan de agahdar dike. Ji bo başkirina rewşa wan hewil dide.
- Gelê Swêdê di derheqa pirsra Kurd û Kurdistanê de agahdar dike û ji wan doza piştgiriyê dike.
- Li dij zordestiyê piştgirîya tevgera gelê Kurdistanê ya li Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê dike û ji bo parastina nasnameya neteweyî xebatê dike.
- Bi rêxistinên demokratîk û civakî (çi swêdî,çi biyanî) re hevkarî dike.
- F K K S ê ji bo mafên biyanîyan û penaberiyê li gor peymanên navnetewî û prensîbên beyana cihanî ya mafên mirovan bèn parastin dixebite.

Komîteyên Federasyonê

Ev komîteyên Federasyonê di kongreya 19em a Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ku di 21 û 22ê Cotmeha 2000an de li Stockholmê li avayîya ABF ê de pêk hat, hatin hilbijartin.

Komîteya Karger

Keya Îzol-Serok
Hamed Gohary-Sekreter
Nasir Feyzullah- Berpirsiyarê kultur û perwerde
Vildan Tanrikulu-Berpirsê organizekirina Jin û ciwanan
Nizal Mahmûd- Berpirsê peneberan
Kovan Amedî- Berpirsiyarê peywendiyên navxweyî
Fexreddîn Olçer- Berpirsê aborî
Seyran Dûran(Seroka Komeleya Jinên Kurdistanê)
Şukrî Demir(Serokê Yekîtiya Ciwanên Kurd)

Cîgir:

Ezîze Vatandost
Enver Karahan- kordinatorê Berbangê
Selam Cizîrî

Komîteya Giştî

Emir Circis
Ehmed Sindî
Niyaz Ehmed
Rehman Hessen
Salih Demir
Diyar Mizûrî
Reşîd Ehmedî
Cemil Demircan
Lokman Ertaş
Xunav Xoşnav
Adil Dihokî
Macit Ebdurrehman

Cîgir

Nurî Salih, Gelale Nûrî, Reşîd Battê

Komîteya Rawêj

Cemal Batûn, Mustafa Aydogan, Bubê Eser, Serdar Omer, Şerif Şerîf

Komîteya Revîsor

Asî Rebbatî, Felat Koçkaya, Lokman Polat

Yek ji Biryarên Kongreya 19mîn a FKKSê

"Kongreya 19 mîn a FKKS ji hemû dewletên endamên YE daxwaz dike ku, di pêvajoya danûstandina endametiya dewlata Tirkîyê ya li YE de, pîvanên esasî yê endametiye, weke nimûne ji ew "pîvanên Kopenhagê", bi tu awayekî neyên revîzekirin yan jî rê li ber dewleta Tirkîyê neyê vekirin ku ew van pîvanan li gora dilê xwe şirove bike û dest bi danûstandinên endametiye bike.

Kongreya 19 mîn a FKKS diyar dike ku, di her merheleyên pêvajoya berendametî û danûstandinên endametiya dewleta Tirkîyê bi YE re pirsê kurd û Kurdistanê weke xaleke bi serê xwe bibe mijara şertên endametiya Tirkîyê û di derheqa vê pirsê de daxwazên gelê kurd li ber çavan bê girtin û li ser vê pirsê bi rêxistinên siyasî û demokratîk yê Kurdistanê Bakur ve peywendiyên eşkere bînin danîn."

Di 24ê Adarê de civîna bilind a Konseya Yekîtiya Ewrûpayê li Swêdê çê dibe.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, Hevkariya Hêzên Siyasî yê Kurd û Kurdistanê û Insiyatifa Kurdên li Swêdê bi hev re xwepêşandineke(mitîngeke) organîze dikin!

Beşdarî xwepêşandinê bibin!

Cî: Älvsjö Mössan (Stockholm)

tarix: 24.03.2001(Şemî)

Seat: 13.00-14.30

Komeleya Kurd li Spångayê Di 20.03.2001ê de
Li Egebygårdê agirê Newrozê vedixê! Beşdarî agirê Newrozê bibin!

Newroza we pîroz be!

Newroz- 2001

Cî: Solnahallen(Stockholm)

Tarix: 24.03.2001(Şemî)

Seat: 18.00



Bîranîna Helepçeyê

2001



ci: Adolf Fredriks Kyrka

Tarix: 16.03.2001

Seat: 17.00

Berbang

Hejmar / No: 119, 2001

Berbang organa
Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye
û ji du mehan careke derdikeve

Utges av Kurdiska Riksförbundet i Sverige

Berpirsiyarê giştî / ansvarig utgivare

Keya İzol

keya.izol@kurdiskarf.org

Kordinator

Enwer Karahan

enverkarahan@hotmail.com

Redaksiyon / i redaktionen

Hemed Gohary

sekreter@kurdiskarf.org

Faris Marsil

Newzad Welî

Enwer Karahan

Kovan Amedî

layout -pergela rûpelan

F. Marsil

berbang@kurdiskarf.org

Abonetiya salane / Prenumeration

Ji bo kesan 150 SEK

Ji bo dezgehan/myndigheter 300 SEK

Ji bo welatên din 250 SEK

Bihayê yekane 25 SEK

annons

en hel sida 5000 SEK

Navnîşan / Adress

Berbang

Box 49090

S-100 28 Stockholm

SWEDEN

berbang@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

www.kurd.city

tfn 08-644 6622

faks 08-650 21 20

Postgiro: 64 38 80-8

ISSN 0281-5699

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e. Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji derve tîn, serrast û kurt bike.

Çapxane: APEC-Tryck

Ji bo hemû kes, komele û rêxistinên Kurdistanî

Ez li ser navê Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, sipasiyên xwe ji bo wan kes, komele, rêxistin û partiyên dikim ku ji me re kartên sersalê şandine û bi e-mailê sala me ya nû pîroz kirine.

Digel slavên germ

Keya İzol

Serokê FKKSê

Dê û bavên hêja;

Berbang di rûpelên xwe de, cî dide anons û îlanên mizginiyê, jidayikbûnê, rojbûnê, sersaxiyê, wefatê û hwd.

Ev îlan û anons bê pere ne.

Ev kes yan jî malbatên ku dixwazin îlana rojbûna zarokên wan di nav rûpelên Berbangê de, derkeve divê rismek keça/lawê xwe ji Berbangê re bişînin û di dawiya risim de nav û paşnav û tarîxa dayikbûna wê/wî binivîsînin.

XXX

Berbang wek organa Fedearsyonê ji endamên xwe re bê pere tê şandin. Ew kesê/a ku endamê komeleyê Federasyonê ye û dixwaze Berbangê bixwîne, divê adresa xwe bi wasiteya komeleya xwe ji Berbangê re bişîne.

XXX

Berpirsiyarên komeleyên endam, endam û hevvelatîyên kurd dikarin bi xanepera Federasyonê, çalakî û xebatên Federasyonê agahdar bibin.

www.kurdiskarf.org

naverok

Du bûyer û hin gazin	Keya Izol	6
Adar e	Enver Karahan	10
Aboriya Federasyonê	Fexreddin Olçer	11
Çalakiyên YJK		16
Çalakiyên Komîteya Navxweyi		17
Çalaki û civînên Federasyonê.....		18
Êdî bese perfebûn.....	Viyan Mayî	19
Komeleyên Kurd yên li Spangayê.....		20
Institûtê Ziwan û Kulturê Kirmancî		21
Nûçeyên Malbatî		22-23
Azadiya Mirov	Reşîd Battê	24



PORTRE

**"Yallah şofêr
yallah apar
benî"**

rûpel: 12-15

**Yekîtiya Ewrûpayê û
xebata kurdan
a hevbeş**




rûpel 7-9

Vildan
Tanrikulu

Innehåll

Vi fördömer mordet på den kurdiska flickan	4
Trakasserier och förföljelse av kurder i Iran	5
Kurdiska frågan måste vara ett konkret krav för Turkiets EU medlemskap	6-9
"Målet om mordet på kurdiska flickan"	10
Kurdistans regionala Regering	11
Brev till Kultur minister Marita Ulvskog	12



Du bûyer û hin gazin



Keya İzol
keya.izol@telia.com

Di demeke kurt de du bûyer gelek tesîr li min kirin. Ez dixwazim di vê nivîsê de behsa wan bikim.

Dema ku li zindanên Tirkiyeyê de bi sedan girtiyên siyasî ketibûn greva birçîbûnê hêzên dewletê bi tundî êrîş birin ser wan û di encamê de 30 girtiyên siyasî hatin kuştin, me weke Federasyon bi belavokên pressê û bi nameyake taybetî ji wezîra derve ya Swêdê, Anna Lindh re nivîsandibû û di derheqê vê bûyarê de raya giştî ya Swêdê agahdar kiribû. Me dixwast ku hukumeta Swêdê vê rûreşiyê mehkûm bike. Ji xwe Anna Lindh jî, piştî wan bûyerên neînsanî ku bi destê rejîma hov ya Tirkiye dihat lidarxistin, nerazîbûna xwe bi beyanekê belav kir.

Di wan rojan de, ji bo serokê Federasyonê e-maileke hatibû. Kesê ku nivîsandibû xortekî 17 salî û navê wî Suwar bû. Sûwar nameya xwe bi zimanê swêdî nivîsandibû û bi kurtî acizîya xwe dîyar dikir. Gazin û rexneyên wî ew bû ku em ji bo çî "tiştêkî" li dij van zordestîyan nakin. Sûwar, tebnîyên xwe bi salên berê 10-15 sal, dixemiland. Digot ku; "Federasyon di wan salan de gelekî çalakîyên protestoyê dikir. Ji bo çî îro nake? Helbet tu şika me ji samîmîyeta Sûwar tuneye. Em dizanin ku ew rexneyên xwe ji dil dibêje û ji Federasyonê hêviya xebat û çalakîyan dike.

Gelek caran, gava bûyereke girîng li welatê me diqewime endamên me bi telefon, name yan jî bi nivîs daxwazîyên çalakîyên xurt dikin. Ji ber ku hêviya wan ji Federasyonê heye ew yekser dixwazin Federasyon bi karên wiha rabe. Bibe rêber ji bo xebatên bi vî rengî. Ev ji bo me cihê serbilindiyê ye.

20 salên borî de Federasyon bi sedan caran çalakîyên girîng li dar xistiye. Helwestên me cihê xwe girtiye dengê me hatiye bihistin. Rûreşkirina hemû dewletên dagîrker tevî zordestîyên wan ji aliyê Federasyonê hatiye mehkûmkirin. Îro ji em di vê rê de berdewam in. Hewildanên me ji bo ku em bikaribin bersîvên pirs û pirsgrêkên bi vî rengî bidin, her wekî berê berdewam in. Lê hin tişt ne wekî berê ne. Pirsas esasî ev e.

Em bi tevayî wek kurdên li Swêdê, tevî ku hejmara me li gor berê zêdetir, tevî ku îmkânên û tecrubeyên me li gorî berê dewlementir e, em kêmtir çalak û aktîf in. Ev tendensa ji bo kesên ku bi dehan sal karûbarên siyasî mijûl bûne, xurt e. Lê mixabin di nav ciwanên me de jî hêdî hêdî xurt dibe. Ciwanên kurdên li Swêdê erk û wazîfeyên xwe wek pêşeroja civatê naynin cih. Yan pasîv in yan jî tiştan hazir dixwazin. Xwe naêşînin û di pirsas neteweyî de rolên li gor ku ji wan tê xwestin naynin cih. Gelek xwîngerm (împulsîv) in lê bi tîra xwe ne hassas in. Gelek ciwanên kurdên li Swêdê wek yek nefer di jiyana xwe de serketî ne. Lê belê mixabin di xebatên kollektîf de ev yeka derbas nabe. Di vê rastîyê de para me salmezînan gelek mezin e. Divê em qebûl bikin ku em di mobilizekirina ciwanan de qels in.

Nimûneya duduyan, beşdarîya min li Konferensa salane ya Çepên Ciwanan (Ung Vanster) de bû. Min li ser navê Federasyonê di vê civînê de axaftineke kir. Axaftina min di derheqê pirsas kurd û zordestîya rejîma

Tirkiye bû. Nêzîkî 110 ciwanên Swêdî, di navbera 16 heta 25 salî, li wir bûn. Biryar dane ku îsal kampanyayêke taybetî li seranserê Swêdê ji bo mafên kurdan vekin. Komîteyêke ji 5 kesan ji bo bicîanîna wan çalakîyan pêk anîne. Çend çalakîyên girîng wek, îmza berhev kirin, belavok li ser pirsas kurd û zordestîyên ku li kurdan dibe û herweha gelek daxwazên wan ji hukumeta Swêdê de di rojeva wan de ye. Gava min daxwazên wan ji nêzîk ve dît, ez ji aliyekî kêfxweş bûm lê ji aliyêke din de ez xemgîn bûm. Kêfxweş bûm ji ber ku, pêwîstiyêke mezin ya pirsas kurd ji bo hin gavên weha hene. Xemgîn bûm, ji ber ku bi muqayeseya civat û rêxistinên Swêdî em bi rehetî kêmasîyên xwe yê berbiçav dibînin.


Ciwanên me nebiorganîze ne û her roj ku diçe ji karên komeleyatîyê dûr dikevin. Ez vê yekê wek pirsas acil dibînim û dixwazim careke din bînim bîra hemû dêûbavan da ku li ser vê mijarê em mijûl bibin. Civateke bê ciwanên organîze dê nikaribe xwe biparêze û herweha wê nikaribe fêdeyê bigîhîne neteweya xwe.

Potansiyeleke mezin keç û xortên me wek Sûwar li Swêdê hene divê em wan bixin nava xebata komeloyatîyê.

4-5 mehên li pêşîya me ji bo me mehên girîng in. Swêd serokatîya YE dike. Em dizanin li Swêdê piştigiriyeke mezin ji bo pirsas me heye. Herweha li Swêdê civata me kurdan di warê rêxistinî de bi hêz e. Eger em hemû bi hev re, çî keç û xort, çî salmezînan û malbat, xwe ji bo pirsas xwe mobilîze û aktîf bikin, em ê bikaribin tesîreke mezin li ser helwesta welatên Ewropayê di derheqê pirsas kurdî de bikin.

Divê em bernameyêke taybetî bixin rojeva civata xwe. Tenê bi rexne, gazin guherandinên bîngêhî pêk nayin. Vatinîyêke mezin li ser milê Federasyonê ye. Lê her kurdekî divê di van pirsas de xwedî helwest be, bikaribe hin fêdakarîyan bike.

Mehên pêşîya me dê nîşanê me bide gelo em çiqas serketî ne yan jî bê xîret in.?



Yekîtiya Ewrûpayê û

xebata kurdan a hevbeş



Vildan Tanrikulu
ronide@swipnet.se

Li ser qebûlkirina berendamîya Tirkîyeyê ya ji bo YEyê, raporên pêşveçûnê ku ji aliyê Komîsyona Yekîtiya Ewrûpayê (KYE) ve ji bo salên çûyî hatin amadekirin û "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" ku li bajarê Nice li Fransayê, di civîna Konseya Ewrûpayê hate qebûlkirin, gelek tişt hatin gotin. Di vî warî de, gelek daxwaz û beyan hatin amadekirin û belavkirin. Dema mirov van hemû beyan, daxwaz û dîtinan bi giştî bîne ba hevdu, mirov dikare tesbît bike ku berîya her tiştî, kurd li ser pîrsa pêvajoya endamîya Tirkîyeyê ya YEyê, ne xwediyên helwêsteke hevbeş in û gelek caran jî daxwazên ku wan danin pêş, li gora gavên YEyê, dereng manin.

Nuha li pêşîya tevgera kurdan a neteweyî û demokratîk rastiyeke heye. Ev rastî, berendamîya Tirkîyeyê ye û şertên destpêkirina danûstandinên endamîyê nin ku di "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" de hatin nivîsandin. Eger Tirkîye, an jî YE bi xwe, weke aliyên pîrsa endamîya Tirkîyeyê, guherandinekê çênekin, êdî ev rastî ne bi tesîran û ne jî ji aliyê kurdan ve nema dikare bê guherandin. Loma jî di derheqê danûstandinên Tirkîyeyê û YEyê de, pirsên esasî ên li pêşîya kurdan ev in: **Divê kurd di vê rewşê de çi bikin û çawa bikin? Divê hedef û daxwazên kurdan çi bin? Divê kurd kîjan rê, îmkân û awayên xebatê bi kar binin û divê ji bo van hedef û karên xwe, teqwîmeke xebatê ya çawa tesbît bikin?** Û hwd...

Maf û daxwazên kurdan divê di belgeyên YEyê de bi navê xwe bîn dîyarkirin

Di derheqê şertên destpêkirina danûstandinên endamîya Tirkîyeyê de, belgeya resmî ya yekem, "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" ye. Mixabin di vê belgeya resmî de, behsa kurdan bi gotinekê jî nayê kirin.

Bê guman di "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" de, ne bi tenê şertên siyasî, lê herweha şertên aborî, civakî, kulturî, tîcarî û hwd jî cih digirin. Ji bo me kurdan, di vê belgeya resmî de, beşên herî girîng, beşên şertên sîyasî nin. Ev beş jî li gora şertên ku divê di demeke kurt û dirêj de bîn bicîhanîn, hatin dabêşkirin. Di van şertan de jî behsa kurdan û mafên wan qet nayê kirin. Lê di van şertan de, bo nimûne; "rakirina cezayê dardakirinê, bidawîanîna birêvebirîya rewşa awarte, serbestkirina ziman û kulturên hemû hevvelatîyên Tirkîyeyê" û gelek tiştên din jî henin ku tevgera gelê kurd a neteweyî û demokratîk li Kurdistana Bakûr bi salan ji bo bi destxistina wan xebitîye û gelek caran jî programa daxwazên wê yê acîl ji wan pêk hatiye.

Lê di vê xalê de, divê her kurdê/a ku tédikoşe, da gelê kurd li ser desthilata welatê xwe û pêşeroja xwe ya sîyasî bi xwe biryarê bide, baş bifikire. Çima di vê belgeyê de, angû di vê

Sala 2002ê bi serokatîya Swêdê dest pê kir. Swêd ji destpêka vê sedsala nuh û pê ve, heta şeş mehnan dê serokatîya Yekîtiya Ewrûpayê bike. FKKSê bi minasebeta serokatîya Swêdê ya Konseya Ewrûpayê, raporek amade kir û pêşkêşî serokwezîrê Swêdê Göran Persson kir. Ev rapor li ser pîrsa kurd û Kurdistana bakûr û "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" ye û daxwazên FKKSê yê di vî warî de dîyar dike. Mirov dikare tevahîya rapora FKKSê ku bi zimanê Swêdî hatiye amadekirin, hem di internetê de di malrûpela FKKSê (www.kurdiskarf.org) de û hem jî di vê hejmarê Berbangê (beşa Swêdî) de peyda bike.

peymana yekem de behsa kurdan nayê kirin? Gelo ji ber vê yekê, divê mirov bi tevahî li dijî "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" raweste, an na? Di vê rewşa hanê de, divê kurd daxwazên xwe çawa îfade bikin?

Divê em ji bîr nekin ku, hem di biryarên Parlamentoya Ewrûpayê de hem bo nimûne, di beyana civîna Konseya YE ya bilind a dawîyê de ku li Luksembûrgê çêbû de û hem jî di gelek civînên din de, yanî heta sala 1999an, di çarçoveya mafên mirovî û kulturî de, behsa kurdan û mafên wan hatiye kirin. Ev yek gelek caran bûye sedem ku di navbeyna Tirkîyeyê û YE de, nakokîyên mezin peyda bibin û Tirkîye bi yekalî danûstandinên xwe yên bi YEyê re rawestîne.

Bi qenaeta min, sedema vê guherandinê ya esasî, kurd bi xwe nin. Ez pêwîstîyê nabînim ku di Berbangê de behsa helwestên hêz û rêxistinên demokratîk ên li ser vê pîrsê bikim. Lê, tiştê eşkere heye ku ew jî ev e; di vê pêvajoyê de, kurdan bi giştî jî ne di sewîyeyên sîyasî û demokratîk de, şîyana pêkanîna yekîtiyê û temsîleke xurt nîşan daye û ne jî daxwazên wan zelal bûye. Yanî ji bo pêşkêşkirina daxwazên kurdan ên di derheqa berendamîya Tirkîyeyê de, tu yekdemî peyda nebûye. Daxwazên ku hatin binavkirin jî gelek caran ji wan tiştan pêk hatiya ku îroj di "Belgeya Hevparîyê ji bo Beşdarîyê" de cîh digirin.

Di van deh-panzdeh salên dawîyê de, gelek nimûne henin ku kurd nikarin pê serbilind bin. Dema mirov ji aliyekî ve li gora şertnameya REHEyê ya bi navê şertnameya Parisê, daxwaza çareserkirina pîrsa kurd bike û ji aliyê din ve jî pîvanên senteza vê peymanê û Beyannameya Helsînkîyê a Mafên Mîriovan ango pîvanên Kopenhagê piçûk bibîne, an rojekê tevahiya Ewrûpayê weke "komplocî" bi nav bike, an jî rojekê ji armanca "Kurdîstaneke serbixwe û yekgirtî" danekeve û roja din jî bibêje ku "her awayekî desthilata sîyasî

ji bo kurdan dek û dolabên emperyalîzmê û Ewrûpayê ye û paşverû ye", wê gavê xelk jî dê bi me bikenin û kar û planên xwe jî bi xwe bi rê ve bibin. Bi taybetî dema ku kurd bi bîhengîya xwe ve jî bibin sedem ku helwestên bi vî awayî weke helwesta tevahiya kurdan bê fahmkirin, ev dê her weha be!

Divê em xelqê jî bi kêmanî bi qasê xwe bi aqil bizanibin û divê em bizanibin ku ew jî bi kêmanî bi qasê me, bûyer û pêşveçûnên li Kurdîstana Bakûr û li Tirkîyeyê taqîb dikin, analîz dikin û li gora xwe netîceyan derdixînin.

Eşkere ye ku eger neteweyek di sewîyeya herî nizim de, bi xwe nikaribe di daxwazên xwe de (daxwazên ku dikarin ji YEyê bînin kirin) yekdemî peyda bike, xelqê din bi xwe wan daxwazan naxin rojeva xwe, hin bi rehetî dikarin li gora berjewendiyên xwe yên aborî, sîyasî û leşkerî biryaran bigirin. Û mixabin netîce jî wisa bûye.

Ji ber rewş û sedemên ku min li jorê behsa wan kir, divê daxwazên ku ji aliyê kurdan ve ji YEyê bînin kirin, yekser bi nasnameya kurdan a neteweyî, binavkirina mafên kurdan û mafên wan ên neteweyî û demokratîk ve girêdayî bin. Êdî, daxwazên mîna "bidawînanîna birêvebirina rewşa awarte" û hwd di sewîyeya YEyê de, maneyên xwe ji bo me kurdan wenda kirin.

Ez çarçoveya van daxwazan xal bi xal weha dibînim:

1. Divê pîrsa kurd û pêşeroja desthilata sîyasî ya li Kurdîstana Bakûr di "Belgeya Beşdarîya Hevparîyê" de, weke xaleke taybetî cîh bigire.

2. Divê nasnameya kurd di qanûna esasî ya dewleta Komara Tirkîyeyê de, bê qebûl kirin.

3. Divê kurd li Kurdîstana Bakûr, pêkanîna "armanca serx-

webûna Kurdîstanê" jî tê de, bikaribin bi rê û awayên aştî yên têkoşîna sîyasî ve, xwe îfade bikin, bi rêxistin bikin û bixebitin.

Bê guman weke min li jorê jî behs kir, ev daxwaz çarçoveya daxwazên kurdan in. Her xala ku hatiye diyar kirin, divê bi sedem û pêwîstîyên xwe yên sîyasî û hiqûqî ve bê firehkirin û ji bo danûstendin û xebatên peydakirina piştgirîyê, weke bê qebûl kirin. Ji bo vê yekê jî zanîn, pisporî, nefspîçûkî, îstîqrar û hevkarî pêwîst in.

Kurd mecbûr in ku di daxwazên xwe yên ji YEyê de yekdemî peyda bikin herî fireh a mumkun

Eger kurd bixwazin ji pêvajoya berendamî û danûstendinên (muzakereyên) ku dê di pêşerojê de bi YEyê re bînin kirin, ji bo maf û azadiyên xwe îstifadeyê bikin, wê gavê mecbûr in ku bi kêmanî, li Ewrûpayê, di sewîyeya rêxistinên kurdan ên demokratîk de hevkarî û yekdemî domdar û bîstîqrar peyda bikin. Tiştê wisa bi tenê bi daxwazan pêk nayê. Ji bo vê yekê, beriya her tiştî, divê li ser amadekirina daxwazên kurdan ên hevbeş ku divê pêşkêşî YEyê bibin, xebateke cidî bê kirin, ango li ser vê pîrsê, divê platforma hevkarîya van rêxistinên ya fikrî bê çêkirin. Ev bi serê xwe têr nake. Ev hevkarî divê bi wan rêxistinên demokratîk re bê destpêkirin ku xwediyên temsîl û jiyaneke rêxistinî ya domdar û bîstîqrar in. Ev bi dehan sal in ku li ser hevkarîya rêxistinên kurdan ên demokratîk li Ewrûpayê, gelek tişt hatin gotin û hin gav hatin avêtin. Lê îroj jî tiştê berbiçav li meydana tune ye.

Bi qenaeta min, li Ewrûpayê rêxistinên kurd ên demokratîk divê di derheqê pîrsa kurd li Kurdîstana Bakûr û pêvajoya endamîya Tirkîyeyê li Ewrû-

payê de, hevkarî û yekdengîyeke ava bikin, xwe ji bo xebatek wisa konsantre bikin. Dema di vî warî de, xebateke hevbeş bi ser bikeve û ji aliyê fikrî û rêxistinî ve avahiyek bi îstîqrar û domdar ava bibe, ev dikare ji bo hevkarîyên firehtir ên bi struktureke baştir ve girêdayî jî bibe zemîneke xurt. Hevkarîyeke weha dikare ji bo vê pirsê, hem karên rêxistinên me yên sîyasî û danûstendinên wan ên bi dezgeh û raya wetatên YEyê ya giştî re hêsantir bike.

Rapora FKKSyê ya ji bo serokatîya YEyê dikare ji bo vî karî bibe zemîna mînaqeseya avakirina yekdengîyeke fikrî. FKKS divê ji bo pêkanîna hevkarî û yekdengîyeke weha hîn çalakîr bi-xebite û xebata xwe ya di vî warî de, bi dema serokatîya Swêdê ve bi sînor neke.

Kurd divê xebatên xwe ji "spontanbûnê" (jixweberîyê) xelas bikin

Bi tecrube sabît e ku gelek xebatên kurdan, mîna beyan, daxwaz, protesto û hwd, li ser vê pirsê, li gel qelsiyên xwe yên naverokên xebatan, herweha ji aliyê wext ve jî bi derengî, ango piştî ku bûyer qewimîn derketin holê. Ev yek bi xwe, ji bo encamwergirtinê kêmanîyeke balkêş û xeletîyeke mezin e. Divê em xwe ji vê rewşê xelas bikin û li dû bûyeran nemînin.

Pêvajoya berendamî, destpêkirin û bidawînan endamîya Tirkîyeyê ya YEyê, bi dîtînen herî xweşbîn (optîmîst), pêvajoyeke weha ye ku dê ji 4-5 salan heta 10-15 salan dewam bike. Kurd û rêxistinên wan ên demokratîk û sîyasî jî divê xebatên xwe yên di vî warî de, li gora perspektîfeke weha bifikirin. Plan û teqwîma xebata xwe li gora vê yekê amade bikin.

Bi qenaeta min, di warê plan û teqwîma xebata ji bo vê pirsê de, ev xalên jêrîn girîng in.

1. Taqîbkirina teqwîma ko-

mên YEyê yên xebatê ku bi pêvajoya berendamî û danûstendinên endamîya Tirkîyeyê ve mijûl dibin.

2. Taqîbkirina guherandinên li Dewleta Komara Tirkîyeyê, bi taybetî jî taqîbkirina guherandinên di warê hiqûqî de, analîz û raporkirina van guherandinan û tesîra wan a li ser maf û azadîyên kurdan ên neteweyî (li Kurdîstana Bakûr).

3. Bi armanca ku tesîr li ser rojev û biryarên wan bi xebat û danûstendinên cuda bikaribin bînin kirin, taqîbkirina civînanê Konseya YEyê ya bilind, civînanê Wezîrên YEyê yên Kar û Barên derve û civînanê Komîseriya YEyê ya Berfirehkirinê.

4. Teqwîma civînan, panel, meş, zîyaret û xebatên din heta ku mumkun be, divê bi koordîne bînin amadekirin û divê mirov girîngî û pêşengîyê bide xebatên paralel û hevbeş.

Armanca dîtînen di vê nivîsê de hatin pêşkêşkirin, ev e ku ya ji bo pêwîstî û berpirsiyariyên me kurdan û taybetî jî rêxistinên me yên demokratîk li Ewropayê çarçoveyê xebatê ya giştî pêşniyar bike û divê bê zanîn ku ev pêşniyar bi pîrsa berendamî û pêvajoya endamîya Tirkîyeyê ya YEyê ve bi sînorkirî ye.

Bê guman pêwîstîya her pêşniyar û her xalê bi xwe, bi mînaqeseya û zelalkirinê heye. Ev ji bo her mirovî/ê berpirsiyariyek hevbeş e ku ji bo kurdan desthilata sîyasî ya li her aliyê Kurdîstanê û her weha li Kurdîstana Bakûr jî ji bo xwe erk û berpirsiyariyê neteweyî û mirovî dibînin.

08.02.2000



Franso Herîrî
1937-2001

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdîstana Iraqê û parlamenterê Herêma Kurdîstanê û serokê grûba Partiyê yê Parlamentoyê Franso Herîrî di roja 18ê Sibata li Hewlerê tevî parazgerê xwe ve hat qetilkirin û hin parazgerên wî yên din jî birîndar bûn.

Heta nuha tu agahdarî nehatiye kirin ku Franso Herîrî ji aliyê kî yan jî kîjan hezê ve hatîye qetilkirin.

Franso Herîrî bi eslê xwe Asûrî bû û di sala 1963an û vir ve di nav refên Partiyê de çiyê xwe stendibû û di sala 1979an de bibû endamê Komîteya Navendî ya PDK-Iraqê û demekê jî walîtiya Hewlerê kir.

Bi kuştina Franso Herîrî gelê Kurd û Asûrî lawekî xwe yê hêja, PDK-Iraqê kadroyekî xwe yê zana û bi tercûbe wenda kir.

Em Federasyona Komeleyên Kurdîstanê li Swêdê ji PDK-Iraqê û gelê Kurd û Asûrî re sarsaxiyê dixwazin û daxwaza me ew e ku qatîlên wî di demêke kurt de bînin girtin û tawanbarkirin.

Adar e!



Enver Karahan
enverkarahan@hotmail.com

”Kultura kurdan ne tenê bi zimanê xwe peyivandine. Bi zimanê kurdî axaftina di malê û civatê de serbilindiyeke kurdên Swêdê ye, lê ev têrê nake. Zarokên me bê cejn û ferz û adet dimînin. Ji xêndî Newrozê tu rojeke ku em wek millet, li Swêdê pîroz dikin tune ye. Newroz cejna milî ye û her kurdek divê lê-bixwedî derkeve û wê li gor naveroka wê pîroz bike, lê ji xêndî Newrozê jî cejnên ku bi salan e kurd pîroz dikin heye. Yek jê cejna Remezanê ye û ya din jî cejna Qurbanê ye. Her çiqas ev herdu cejn ji kultura misilmantiyê tên jî, civata kurd jî civateke misilman e û divê kurd weke millet li van herdu rojên miqedes xwedî derkevin. Pîrozkirina Newrozê û ya van herdu cejnên misilmantiyê ne altnatîfên hevdu nin. Di her miletî û di her civatê de, cejnên milî û yên dînî henin û pîrozkirina wan ji hev cuda nin. Li Swêdê, ji kominîstan heta bi xaçperestan cejna xwe ya dînî pîroz dikin.”

Di dîroka kurdan de meha Adarê meheke bi serpehatî û bûyerên girîn ve hilmiştîye. Him ji hêla bûyerên siyasî ve û him jî ji hêla roj û cejnên milî û kulturî de, maneya vê mehê mezin e. Ji nav van bûyer, cejn û rojên milî û kulturî de, bê şik, ya herî bîmane Newroz e. Bi salan e kurd, çî li welêt û çî li derveyî welêt ve roja xwe ya milî bi awayên cûda, lê bi naverokeke hempar pîroz dikin. Ji xêndî ve roja neteweyî, rojeke din heye ku di dîroka kurdan a nêzîk de, rojeke biêş û elem e û ew jî roja bibîranîna Helepçeyê ye. Lê ev Adara îsal (sala 2001ê) li rojeke din ya miqades rast tê, ew jî cejna Qurbanê ye.

Ji xêndî van rojên milî, rojeke din heye ku ew him ji bo jinên kurd û him jî ji bo hemû jinên cîhanê yên bindest, rojeke navneteweyî ye û ew jî bi navê heyştê adarê tê pîroz kirin. FKKSyê, heya nuha ji xêndî eydiya Qurbanê ew hersê rojên din wek çalekiyên xwe pîroz kirine.

Helbet ji xêndî van rojên ku ji bo kurdan bi mane nin, roj û bibîranînen din jî di vê meha mizgîniya biharê de henin. Lê mexseda vê maqaleyê ne ew e ku hemû wan rojên ji bo kurdan biqîmet in rêz bike. Û nemaze jî ji bo kurdên ku li Swêdê dijîn.

Ev Adara ku li pêşiya me ye, ji bo kurdan û bi teybetî jî ji bo kurdên li Swêdê dijîn maneyeke wê ya din heye. Weke tê dizanîn dewleta Swêdê, di vê dema li pêş me de serokatiya Yekîtiya Ewropayê dike. Ji ber vê yekê jî vazîfeyê mezin li kurdên Swêdê dikeve. Û nemaze jî ev wazîfe li dezgeh û rêxistinên kurdan dikeve ku di vê pêvajoya berendametiya Tirkiyeyê de, siyaseta wê ya di derbarê meseleya kurdan de eşkere bike û ji bo qebûlkirina mafên kurdan yê demokratîk û neteweyî tesîrê li rojeva dewletên YEyê bike.

Bi vê mebestê, FKKS, HEVKARÎ û ÎKSê bi hev re biryar dan ku di vê pêvajoyê de bi hev re kar bikin û çalekiyên kîtlewî û diplomatîk pêk bînin. Ji van respît û çalekiyana, yên herî girîn jî di rojên Konseya Wezîrên Yekîtiya Ewropayê (KWYE) bicivin de, mitîngên mezin li dar bixin. Yek ji wan xwe pêşandan, di 24 Adarê de ye û di eynî rojê de, dê cejna Newrozê li Solna halenê bê pîroz kirin e û ya din jî di 15 û 16ê meha Hezîranê de ye.

Ji bo em kurdên li Swêdê bikaribin di vê pêvajoyê de bibin dengê hemû kurdan, divê di wê rojê de, ji her terefê Swêdê beşdariya kurdan teva zaro û zêçan pêk were. Ji bo vê yekê jî vazîfeya pêşî li komeleyên Federasyonê û fonk-

siyonelên wê (Yekîtiya Jinan û ya Ciwanan) dikeve.

Bi vê minasebetê dibe ku dengê min here jin û ciwanên kurd jî. Du heb dînamîkên civata kurd yên esasî, jin û ciwan in û bi vî navî jî du rêxistinên Federasyonê yên esasî nin û destûra FKKSyê rê daye wan ku li ser navê seksiyonên xwe, bêyî ku di kongreyên FKKSyê de bînin hilbijartin, bi kontejanê dikevin Komîteya FKKSyê ya Karger. Lê sed mixabin ku ev herdu beşên civata me û fonksiyonelên FKKS yê yên esasî (nemaze jî Yekîtiya Ciwanan) bê fonksiyon in. Helbet sedemên vê pasîfîzebûyîne heye û divê mirov bi awayekî cidî li ser vê meseleyê raweste. Hemû kêmanî ne yên jin û ciwana nin, di vê meselê de kêmaniyên malbatan jî bi qandî yên berpirsiyarên FKKSyê, YJ û YC an, heye. Ez ê di vê nivîsê de nekevim navê minaqaşeyê, lê di nivîseke din de, ez ê bixwazim ku li ser vê meseleyê minaqaşê bikim. Bi baweriya min divê kurdên li Swêdê dijîn dest bi minaqaşeyê bikin.

Em kurdên li Swêdê dijîn pir dipeyivin lê em minaqaşê nakin. Ger minaqaşeyê me ya piçûk hebe jî di warê siyaseta de ye. Di wê meselê de jî em hevîr di zikê hev de distirên, wekî din mesafeyê me ya ber bi çav tune ye.

Bi ya min divê em di derheqa civata xwe de minaqêşe bikin. Ji ber ku civata me ya li Swêdê ber bi jî hevdu dûrketinê û bêhêvîyê dehere. Di têkiliyên civakî de sarbûnê ber bi çav heye. Minaqêşeyên di derbarê adet û kulturê de, bi awayekî bê ser û ber û bêberpirsiyarî fireh dibe. Di vê derheqê de li ser bûyerên ku di vê sala dawiyê de qewimîn û kurdên ku peyv pê disekinîn îmtihaneke baş nedan.

Kultura kurdan ne tenê bi zimanê xwe peyivandine. Bi zimanê kurdî axaftina di malê û civatê de serbilindiyê kurdên Swêdê ye, lê ev têrê nake. Zarokên me bê cejn û ferz û adet dimînin. Ji xêndî Newrozê tu rojê ku em wek mîlet, li Swêdê pîroz dikin tune ye. Newroz cejna mîlî ye û her kurdek divê lêbixwedî derkeve û wê li gor naveroka wê pîroz bike, lê ji xêndî Newrozê jî cejnên ku bi salan e kurd pîroz dikin heye. Yek jê cejna Remezanê ye û ya din jî cejna Qurbanê ye. Her çiqas ev herdu cejn ji kultura misilmantiyê tîn jî, civata kurd jî civateke misilman e û divê kurd weke mîlet li van herdu rojên miqedes xwedî derkevin. Pîrozkirina Newrozê û ya van herdu cejnên misilmantiyê ne altnatîfên hevdu nin. Di her mîletî û di her civatê de, cejnên mîlî û yê dînî henin û pîrozkirina wan jî hev cuda nin. Li Swêdê, ji kominîstan heta bi xaçperestan cejna xwe ya dînî pîroz dikin.

Divê em kurd jî cejnên xwe yê dînî li gor naveroka wan pîroz bikin. Ew kesên ku bawerîya wan pê tune be û nexwazin pîroz bikin divê mirov hurmetê jê re bike, lê bi tevayî, divê FKKS wek dezgehekî mîlî van cejnên dînî pîroz bike û pêşengîya wê bike. Yê min jî wek şexis; ez bang li we kurdên li Swêdê û Ewrûpayê dikim ku em roja eydiyê herin malên hev û yê min jî vê eydiya Qurbanê û pêve, ez li mala xwe eydiyê datînim û li cîranê der û dora xwe digerim. Ji anuha de, cejna we ya Qurbanê pîroz be!

Aboriya Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê

Fexreddîn Olçer

Endamê Komîteya Karger
û Berpirsiyarê Aborî yê Federasyonê

Hatiniyên Federasyonê

Wek tê zanîn hatinên Federasyonê yê girîng, alîkarîya ku Federasyon ji bo xebatên xwe ji daîra bîyanîyan (Integrasyonverket) werdigre. Ev alîkarî, alîkarîyêke salewext e û ji her jî sê mehan carekê didin. Ev alîkarî salê nêzikî heştêsed hezar (800.000) kronê swêdî ye.

Hatinên din yê berbiçav birêvebirina projan e, ev jî girêdayê ku ka Federasyon wê çî projan çêbike û wê ji aliyê mercîyên swêdî de bê qebûlîkirin yan na.

Alîkarîyêke din û bi bi dîtina min gelek girîng e, ji bo ka ku meriv çiqas xwedî berpirsiyar e, ew jî heqê endametiya komelên endamên Federasyonê ne. Lê mixabin kêma komele ev wetenîyên xwe bi cîh tînin. Ji bo vê yekê jî, ji bo ku heqê endametiya ji komelan bigrin gelek caran ji komelan ra name rêdikin. Hatiniyêke din, hatinekî pîrî piçûk jî heqê abonetiya kovara BERBANGê ye.

Çûyinên Federasyonê

Mesrefên Federasyonê yê herî mezin, ku heya meha cotmeha 2000î mesrefek gelek mezin e, ew jî kirêya lokala Federasyonê bû û ev mehê 23.000 kronê swêdî bû. Lê niha wek Federasyon em jî heqê kirê xelas bûne. Ji ber ku me ji bo Federasyonê xanîyêk mîlî standîye. Ev stendin jî li ser Federasyonê bi milyonek (1 000 000) kronê swêdî dibê mal. Me ev milyon ji bankê bi faîz deyn kirîye. Li gorî hesabên Federasyon di nav şeş salan de vî pereyî bide.

Berbang û baca karkirên Federasyonê

Mesrafên din yê Federasyonê heqê çapa Berbangê ye, ev jî her hejmarek di navbera 20.000 û 23.000 kron de, li gorî reng û hejmara rûpelan tê guhartin. Mesrefên din jî, maaşê û bacên (vergîyên) karkerên Federasyonê ne. Niha çar karkerên Federasyonê hene. Didu ji wan niv û didu jî tam kar dikin. Wek di mesref heqê telefonê, internetê, poste û boyaxên makîna nin, çûyinên pîrozîya NEWROZ e û yê meşana ne.

Heqê çûyin û hatinên civînan e

Helbet mimkûne ku wek salên 1997-98 an problemên aborî di pêşerojê de derkevin pêş. Wek tê zanîn salên 97-98 an federasyon tu alîkarî negirt û di rûnê xwe de qijîlî. Ji bo ku pêşerojê de problemên aborî dernekevin, divê her kurdê ku ji xwe ra dibêje ez welatparêzîm divê li Federasyonê xwedî derkevin. Ev erkekî welatparêzîyê ye.

Nav: Mamoste Nûjen, Kengî hatiye Swêdê: 1982, Mesleg: Şofêr, Li kuderê dijî: Stockholm, Temenê wî: 47, Malbat: Bavê 5 zarokan e, Parola wî: "tam taxim 240(o)"

"Yallah şofêr yallah, apar benî"

"Solcî" bi xwe jî nizane rojê çend caran "sollama" dike. Carina bi şev heta serê sibê, carina jî ji şeveka sibê heta êvarê dîreksiyonê dizivirîne. Papûr, kolan û kuçeyên paytaxta Swêdê wek riya mala xwe dizane. Ger rojê du-sê caran rêwîyan bibe Arlandayê (balafirgehe Stokholmê) û ji li wê jî dagirtî vegere yewmiya wî ya wê rojê derdikve û wek mêrikê tirk dibêje; "Allah bereket versin" û taksîmetroya xwe digre û berê xwe dide qahweya Hecî da ku bi lîstika "nezereyê" stersa xwe ya wê rojê li ser xwe bavêje!

Faris Marsil
Berbang@kurdiskarf.org

best" hîlbijartin. Piraniya wan di sektora xizmetê de kar dikin. Dukandarî, aşxanetî, pizeriacîti û taksîcîti hin ji wan karên bingehîn ku biyanî di wan de serdest in.



Ew kurdên ku ji ber sebebên siyasî û aborî terka welatê xwe kirin û li welatên Ewrûpayê bi cî bûn, gelekî ji wan jî xwe re meslegên "ser-

Multeciyên ku diketin kategoriya aborî ji xwe armanca wan ew bû ku ji bona "zikê xwe têr bikin" hatibûn xurbetê. Yanî ew ji bona "nan" derketibûn

derveyî welêt, lê îro piraniya wan bûne xwediyê "firinê". Ev tişt ji bo gelekî penaberên siyasî jî êdî bûye fenomenêke tabîf.

Ew kesên siyasî ku hatin Swêdê, pro-senteke mezin ji wan xwende û xwediyê diplomayên bilind bûn. Huqûqnas bûn, mamoste bûn, muhendîs bûn yan jî xwendina xwe ya zanîngêhê nivcû hîştibûn... Gelekî ji wan ne ji dilxwaziye, lê ji mecbûriyetê derketibûn Ewrûpayê. Armanca û niyeta wan ew bû ku, dê di demeke kin de dîsa wegeriyana welêt. Ji bona wê jî aktîv bi siyasîyê re mijûl bûn û neketin nava wê sîstema ku ew li wî welatê dijiyan.

Lê sal derbas bûn, "hesabê malê û sûtê li hev nat", şert û merc wan jî mecbûr kirin ku ew jî têkevin bazara kar. Piraniya wan karê ku hinek pereyên wê zêde û bi îzafî jî serbest bû hîlbijartin... Karê taksîciyê, yanî şofêrtî.



Îro di vê sektorê de gelekî kurd kar dikin. Kurdên ji Kurdistanê Îranê wek gelek waran de, di vî warî de jî di bin tesîra Farisan de mane û wek wan taksîciyê dikin. Îranî di warê taksîciyê de pêş in û çend şirketên wan jî hene. Ji kurdên Kurdistanê Iraqê jî kesên ku taksîciyê dikin, hejmara wan ne kêman.

Yên ku meslegê wan tunebe yan jî di meslegê xwe de kar nebînin vê riyê didin pêşiya xwe û dibin şofêrê taksiyê. Lê li welatên Ewropayê şofêrtî jî ne hêsa ye. Heta meriv belgeyên wê bi dest bixe, divê meriv di çend qonaxan de derbas bibe.

Taksîciyê meslegeke serbest e û qezence wê baş e, lê problemên wê jî gelek in. Şofêrêkî dostê min carekî ji min re meslegê taksîciyê weha tarif kiribû; digot; "Di eslê xwe de li welatên Ewropayê taksîciyê hemalî ye, yanî hemalîyeke, bi wesîqe û forma wê hinekî guhartî, yanî modern... Çawa li welêt he-

mal serê sibê zû radibûn diçin kar û yewmiya xwe bi sêlika piştî xwe, yan jî bi erbeyî destan derdixin, taksîciyê jî weha ye. Em jî di berbanga sibê de radibin heta êvarê yan jî bi şev heta serê sibê vî karî dikin. Tenê em ne bi kişandina mal, lê bi birin û anîna însanan mijûl in; yanî bi formekî û bi wasîteyêkî guherî karê hemalîyê dikin."

Ev gotina wî, rastiyeke din anî bîra min ku kurd di destpêka sedsala 20an de jî, him li Tirkiyeyê (Stenbolê) û him jî li Amerikayê debara xwe bi xemalîyê derbas dikirin, di destpêka sedsala 21ê de jî ew vî "meslegê" xwe bi formekî din dom dikin. Wer xwiya ye, ev jî qe-dera kurdan e!

Di van salên dawiyê de di nav kurdên bakur de jî, ev mesleg raxbet dibîne. Mamoste (A.Rahman Gezgin) jî yek ji wan bû ku ketibû vî karî.. Wek jî navê wî jî dihat fêmkirin ew bi xwe li welêt mamoste bû, lê meziyetekê wî yê din jî hebû ku, bi çêkirina karîkatoran

"Multeciyan ku diketin kategoriya aborî ji xwe armanca wan ew bû ku ji bona "zîkê xwe têr bikin" hatibûn xurbetê. Yanî ew ji bona "nan" derketibûn derveyî welêt, lê îro piraniya wan bûne xwedi-yê "firinê". Ev tişt ji bo gelekî penaberên siyasî jî êdî bûye fenomenêke tabîi."

ve mijûl dibû. Piştî hat Swêdê, di vî warî de gelek berhemên hêja afirand. Du pirtûkên wî yê karîkatoran yek bi navê "Dengê Xêzika:" (1984) ya din jî bi navê "Mêr mêra nas dîke" (1993) di nava weşanên Jina Nû de hatin çapkirin. Bi navê "Îsot" di sala 1985-86 kovarê karîkatorê ya mîzahî ku 9 hejmara wê derket, derxist. Mamoste yek ji

wan karîkatoristê yekem ê ji Kurdistana Bakur e ku di beşa xwe de xwediyê îmzayê ye. Karîkatorên wî di gelek rojname û kovaran de hatine çapkirin.

Gava ew li welêt bû, di nav hevalên xwe de ji Mamoste zêdetir wek "Solcî" dihat naskirin. Ne ji ber ku ew Solcî (çep) bû ji re digotin "Solcî", lê, ji ber ku bavê wî goşkar (solcî) bû, hevalên wî, ev nav lê kiribûn. Lê di eslê xwe de, di dema xortaniya xwe de pîrr solcî (çep) bû û dîtinên çepîtiyê bi heyecan û bi heraret diparast. Milîtanekî tevgera Şoreşgerên Demokratîk bû. Yanî bi mahneya îdeolojîk jî ew solcîyekî temam bû.


Solcîtiya (çepitiya) wî, di navên zarokên wî de jî diyar dibû. Navê keçên wî Devrim (şoreş) û Bêrivan, navê lawên wî jî Özgür, Ulaş û Cesur bû. Hemû zarokên wî jî li welêt hatine dinyayê. Keça wî Devrim li Stokholmê Fakulteya Huqûqê xelas kir, kurê wî Özgür bi artistiyê aleqedar e, di çend tiyatroyên û filmên swêdî de rol girtiye. Êdî hemû zarokên wî debara xwe bi xwe dikin.

Mamoste jî salên destpêkê aktîv bi siyasetê û bi karê weşaniyê re mijûl e, lê di sala 1987an de bi şofêrtiya otobusa belediyyê dikeva piyaseya kar. Heta 1993an vî karî dike. Êdî ev kar jê re monoton tê, herroj di eynî rîyan de çûyin û hatin wî aciz dike. Li gorî ku ew dibêje; "Ev acizbûn û monotonî dibe sebeb ku ew dev ji şofêrtiya otobusê berde û karekî din bike". Taksîcîti jê re hin cazîb tê. Ji xwe ehliyeta wî ya otobusê belgeyê ku bêyî ku ekstra here kurseke din, ew dikare bi vî ehliyetê teksîcîtiyê jî bike.

Min jê pirsî, wî jî got:

-Zahmetiyên we çi ne? Di pressê de tê nivîsandin ku di van demên dawiyê de gelek taksîcî tîn şelandin, qet tiştê weha hatiye serê te?

Di eslê xwe de ji bo wan kesan ku mecbûr in vî karî bikin, taksîcîti nekarî xerab e û peryên wî jî baş e. Lê divê meriv vî meslegî wek meslegên din bihesibîne û di şirketekê de, rojê 8-10



Li Stockholmê jinên ku erebeyên zarokan bi wan re be, belaş li otobusê siwar dibin.

seet kar bike û karê mirovan bi roj be. Lê hîrsa qezenckirina pere destnade ku em weha bikin, ew rê dide ku gelekî ji me derkevin derveyî rûtînan. Wek min got ku meriv bi roj û normal kar bike tu problemên wê tunene. Lê ku meriv anormal rojê ji 10 seetatan zêdetir kar bike û bi salan weha dom bike, tendurîstiya meriv zerarê dibîne. Bifikire meriv rojê 14-15 seetatan tenê bi rûniştinê jiyana xwe bidomîne, dê çi bibe, dê roj bê ku meriv nikare piya bisekine; îro ev problemeke mezin e ku şofêr pê dijîn.

Ji aliyê din ku meriv bi şev kar bike, derdê serxwşan nayê kişandin, hinek siwar dibin, peryên wan tune, hinek din pere nadin û direvin. Yanî taksîcîti dinyayeke cudaye. Meriv dibe şahîdê gelek bûyan. Heta nuha ez natime şelandin. Kesên biyanî piranî karê şelandinê dikin ew jî zû bi zû tedaxulê şofêrê biyanî nabin.

-Rojê çend seet kar dikî?

Ez rojê 10-12 seet kar dikim.

-Mehê çiqas pere dikeve destê te?

Mehê di navbera 15-20 hezar kron dikeve destê min.

-Ma çima şofêr evqas zêde kar

dikin. Ma hûn wext nadin malbata xwe?

Min berê hîn zêdetir kar dikir. Nuha ev taksîya ku bi kar tînim, taksîya min e, ez wek "fri taksî" kar dikim. Divê ez teksîdê wê bidim. Ji bona wê jî ev serê salekê ye min ji xwe re kiriye prensîb wexta ez rojê 2000 kron qezenc bikim, ez qontaxa taksîya xwe digrim. Ji ber ku taksîya min girêdayî şirketekê nîne, muşteriyên min kêman, guzergahên me fri taksî diyar in; em nikarin her cî bisekinin, ji bo wê jî ev du hezar carna zû, carna jî 10-12 seetatan de qezenc dikim.

Bifikire e, carina muşteriyekî dibim Arlandayê (balafirgeha Stockholmê) ji bo ku ji Arlandayê dagirtî vegerim carna 3 seetatan zêdetir li wê disekinim. Ji bo wê jî, di taksîciyê de wext zû derbas dibe. Yanî bi aweyekî din çiqas wextê te hebe, evqas zêdetir pere qezenc dikî.

- Bi tevayî taksîcî, û bi taybetî jî taksîciyên kurdan çima evqas xîrsa qezenckirina peryan ba wan heye, bi wan peryan çi dikin?

Pere şîrîn e!. Yên ku ez nas dikim û hûn jî dizanin, ew li Tirkiyeyê û Kurdistanê ji xwe re xanîyan dikirin, li vir

Bîraninek

Gelek tişt di serê şofêran de diqewimîn. Mamoste qala bîranineke xwe dike; "Careke ji Arlandayê muşteriyek siwar dibe û hinek serxweş e. Ji Mamoste re dibêje; "min bibe Sundbybergê (taxeke Stockholmê)," lê Mamsote dewsa Sunbybergê, Sundsval fehm dike (Sundsval 50 mîl dûrê Stockholmê ye) û dikeve rê, nêzî 15 mîl diçe, muşterî dibêje; "Ji kerema xwe re bisekine, ihtiyaciya min ya tuwaletê heye". Lê êdî serxweşiya mêrik ji kêma bûye, ew derdikeve derve, li dora xwe dinêre çiyekî din e. Dibêje; "Em li kuderê ne."

- Mamoste dibêje "Em nêzê Gävleyê ne, em diçin Sundsvalê." Mêrik mat dimîne û dibêje; "- Ma heyran çî karê min li Sundsvalê heye, min got, min bibe Sundbybergê" Yek ji wî, yek ji Mamoste; di neticeyê de Mamoste jê re dibêje; "De bila ev bûyer ji bo te bibe bîranikeke, tu yê bêjî, min ji Arlandayê taksîyeke kirê kir, ez çûm Gävleyê tuwaletê û vegeryam."

Jî xanî ji xwe re dikirin, wexta ez dibêjim xanî vila jî dikevin vê katagoriyê. Hinekî din dixwazin taksî ji xwe re bikin, yan jî taksîya wan heye, dixwazin taksîyeke din bikin. Werhasil herkes bi aweyekî peryên xwe radizînin.

-Gelek taksîciyên kurd hene, ma hûn nafikirin bi hev re şîrketêke mezin ya taksîciyê ava bikin?

Di navbera me taksîciyan de reqabet heye, ev rê nade ku em bi hev re şîrketê taksîciyê ava bikin. Du-sê şîrketên Îraniyan hene, lê ew jî di warî xwe de nebisirketîne. Ji aliyê din ma kurd di kîjan warî de bi hev dikin ku, di warê ticarêta de jî bi hev bikin. Ji xwe gelek nimûne hene ku kurd di ticarêta de qet li hev nakin.

-Wexta taksîci tên ba hev bi hev re çî dipeyivin?

Ne tenê wexta em tên ber hev, hemî دنیا me, yanî çî dema kar û çî jî derveyî kar hemû axaftin û sohbetên me li

ser şofêrtî û taksîciyê ye. Yanî wê rojê çî di serê me de qewimiye em bahsa wê dikin. Tabîî paşgotinî jî ne kêma e. Navbera şofêran de reqabet heye!!

-Ma taksîciyê evqas zêde kar dikin, wextê wan dimîne ku ew bi zarok û malbatên xwe re derbas bikin?


Taksîciyê rezaletî ye. Meriv dibe asoyal. Jiyanêke te yê sosyal tune. A min dîsa baş e, zarokên min mezin in, herkes debara xwe bi xwe dike. Û ez li gorî kesên din hindik kar dikim. Bi rastî jî problem e, ku meriv rojê 15-16 seatan kar bike, seatên mayî jî bi xewê derbas bike, û ku ev jî bibe rûtin û bi salan dom bike problemên civakî rû didin. Malbat ji hev cuda dibin, zarok bi taybetî jî ciwan dikevin riyên xerab. Di nuha de di nav şofêran de problemên civakî dest pê kirine; veqatandin zêde bûne. Gelek swêdî ji bo vê yekê dev ji şofêrtiyê ber didin û wexta xwe didin malbata xwe.

Li ser pîrsa min a ku tu sibê vegerişê wê tu yî li wê jî şofêrtî bikî ya na, Mamoste disekine û difikire, û dibêje welleh ez qet nefikirîme û axaftina xwe dom dike; "ma ez li wê mamoste bûm". Di eslê xwe de di hundirê vê bersivê de her tişt heye; "ma ez li wê mamoste bûm" Ev bersiv îzaheta rewşa biyaniyê vekirî dide. Tiştên ku Mamoste qal dike ji re ne gotin, ne jî şîrove divê. Li xurbetê pere qezenckirin ne hêsa ye.

Lê tiştê ku ez zanim, her tiştî me kurdan anormal e. Ji xwe kurd du rengan, hinek ji wan jî navê sê rengan dizanin; Reş, sipî û sor. Lê jîyan ne tenê ji van rengan pêk tê. Derveyî jîyan şofêrtiyê, jîyananêke pîralî heye.

Wexta min dest bi dibistanê kiribû, mamosteya me ji me re dersa demsal, roj û seatan dida. Digot; "di rojekê de 24 seat heye, meriv 8 seat radizê, 8 seat kar dike û 8 seat jî îstirhet dike (digere, dixwîne, avjîniyê dike, spor dike, bêşdarî aktivîteyên sosyal dibe û hwd.)

Wer xwiya ye ev norma jîyanê ne ji bo vî meslegê ye!!



"Taksîciyê rezaletî ye. Meriv dibe asoyal. Jiyanêke te yê sosyal tune. Yê min dîsa baş e, zarokên min mezin in,

herkes debara xwe bi xwe dike. Û ez li gorî kesên din hindik kar dikim. Bi rastî jî problem e, ku meriv rojê 15-16 seatan kar bike, seatên mayî jî

bi xewê derbas bike, û ku ev jî bibe rûtin û bi salan dom bike problemên civakî rû didin. Malbat ji hev cuda dibin,

zarok bi taybetî jî ciwan dikevin riyên xerab. di nuha de di nav şofêran de problemên civakî dest pê kirine; veqatandin zêde bûne. Gelek swêdî ji bo vê yekê dev ji şofêrtiyê ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

ber didin û wexta xwe didin malbata xwe."

Ç a l a k i y ê n

Yekîtiya

Jinên

Kurdistanê

Li gorî destûra YJK û FKKS ê bingeha YJKê ji seksiyona jinan yen komeleyên girêdayiyê FKKS ê ne, pek tê . Lê mixabin di van salên dawîye de di piraniya komeleyan de seksiyona jinan yan têk çûbû yan ji lawaz bibûn. Ji ber wê di kongra 19min a FKKS ê de li gor pêşniyara YJKê biryar hat girtin ku isal FKKS girangi ya xwe bide reorganîzekirina YJK û YCKê. Di eyni wextê de, di kongra YJKê de jî biryar hat girtin ku em isal giraniya xwe bidin damazrandina seksiyona jinan.

Ev çar meh in em wek YJK bi alikariya berpirsiyariya komîteya reorganîzekirina YJK û YCK ê a FKKSê re giraniya xwe da damezrandina seksiyona

jinan yê komeleyan. Heta iro nezîkê neh seksiyonên jinan hate amadekirin. Bi vê awayê têliyan me bi seksiyonan re baştir û germtir bû. Armanca me ew ê ku em heta kongreya YJK ê hejmara seksiyonên jinan bigîhinin hejmara komeleyan. We çaxê bi rastî em ê bibin yekitîyêk bi hêz û çalek.

Di destpeka karên xwe de me seredana hinêk projeyan kiribû, yek wan jî ye Integrationsverketê bû û me bersivêke erênî wergirt.

Proje li ser "rola dê û bavan di pirsra ciwanan de"

Bi Kvinno-SIOS re ji isal di 3 projeyan de em ê bi hew re kar bikin

1- Li ser mesela vekhewî li federasyonan û komeleyên federasyonan de be çaraserkirin

2- Li ser rola dê û bavan di pirsra ciwanan de

3- Li ser nexweşîya jinan

Ji bo van çar projan me 6 komele hîlbjartin . Ji her komeleyê dê du kes (yek jin û yek mer) bibin berpirsyar ku di komeleyên xwe de li ser van projeyan xebatê bikin.

Li gor programa me, em dixwazin di şeş bajaran de ji dê û bavan grupan amade bikin ku alikariya dê û bavan û ciwanan bikin. Di nav salakê de hinek semîner û panelan amade bikin. Ji bo havine jî, ji iro de bi projeya Federasyonê re me havîngeheke kirê kiriye . Li ser havîngehê em ê bi taybetî agahdarî bidin.

Di 8ê Adarê roja jinan a navneteweyî de isal em ê wek Kvinno-SIOS bi UNIFEM Komite re piroz bikin.

Program saet di 8.30 de li Kulturhusetê (Selgerstorg) destpê dike , heta eware saet 21.30 berdevam dibe. Di programê de semîner, panel , muzik, xwarin-wexarin, xwepêşandan û şahî cih digire.

Di van kar û xebatan de beşdariya we (jin-mer) dê me bi hêztir bike û moral bidê me.

Em bi hev re xurttir û çalektir in!

Beşdarî pîrozbahiya 8ê Adarê bibin!

Di 8ê Adarê roja jinan a navneteweyî de Jinên Kurd wek Kvinno-SIOS bi UNIFEM Komite re piroz dikin!

Program saet di 8.30 de li Kulturhusetê (Selgerstorg) dest pê dike û heta saet 21.30 berdevam dike.

Di programê de semîner, panel, muzîk, xwarin-wexarin, xwepêşandan û şahî cih digirin.

Rapora civîna herema 3an

Di roja 3.2.2001ê de Komîteya herema 3em civîna xwe ya yekem li lokala komeleya Eskilstunayê çê kir. Nûnerên van komeleyên li jêr beşdarî civînê bûn.

Nûnerên Komeleya Kurd li Linköpingê Osman Suleîmanî, Gulale Osman, Khalîd Sulîmanî. Nûnerên Komeleya Kêmendamenê Kurd li Lindköping: Najemadîn Fakhradîn, Ayar Bakî. Nûnerên Seksiyona Ciwanên Kurd li Lindköping: Salam Kadîrzade, Bawar Talabanî. Nûnerên Komeleya li Norrköpingê Wesîle Altan, Dilêr Kader. Nûnerên Komeleya Çanda Kurd li Örebroyê Nûrî Salih, Osman Kasan. Nûnerên Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê Cemîl Demircan, Menaf Hasan, Dijwar Jemîl, Dildar S.Taha, Firat Nemrûd û Diyar Mizûrî.

Di civînê de komeleyên heremê li ser rewşên komeleyên xwe li ser planên xwebatên xwe agahdarî dan. Ji bo başkirina rewşa Komeleya Norrköpingê, li ser îmkana hat sekinandin.

Komeleyên heremê biryar girtin ku ji bo beşdarîya çalakîya 24ê adarê wê hewildaneke xurt bidin.

Rapora civîna herema 5an

Di 6.1.2001ê de, Komîteya Herema 5 an civîna xwe ya yekem çê kir. Nûnerên van komeleyên ku beşdarî civînê bûn ev in; Komeleya Kurd li Malmo, Komeleya Aşîtî li Malmo, Komeleya Kurd ya Kulturî li Helsingborg û Komeleya Kurd ya Kulturî li Kristiansstadê. Komîteya Heremê programek xebatê ya dewlemend danî pêş xwe. Yek ji wan biryaran ew e ku di komeleyên endam de seksiyonên Jinan û ya Ciwanan ava bikin. Biryara duwem jî ew bû, ku hewildanek bê dayin ku ew komeleyên kurd yê li bajarê Malmöyê henin bibin yek komele.

Li ser biryara heremê ya civîna yekem, di roja 4.2.2001ê de civînek ji bo yekitîya van komeleyên Kurd ku li bajarê Malmöyê henin, çê kirin. Kome-

leya li Malmöyê, Komeleya Kurd li Malmöyê, Komeleya Kulturî û Werzişî li Malmöyê beşdarî civînê bûn. Kesên civînê gîhiştin wê qeneatê ku ji bo yekitîya komeleyên kurd li bajarê Malmöyê, komîteyek hevbeş pêk bînin ku ev komîteya hevbeş ji bo yekitîya komeleyan kar bike.

Komeleya Kurdistanê li Eskilstunayê kongreya xwe ya 16 min di 17.12.2000an de pêk anî. Kongre organên xwe yê nû helbijart. Hemîd Gewherî li ser navê KPN beşdarîya kongrê kir.

Komîteya Karger Serok: Cemîl Demîrcan, Sekreter: Menaf Hesen, Sekreterê aborî: Dijwar Jamîl, Berpirsiyarê peyvendîya: Firat Nemrûd, Berpirsiyarên karên kulturî: Sidîq Jahanî û Dildar Salih, Berpirsiyarên karên Ciwanan: Aware Ahmedî û Metîn Kilincalan. Berpirsiyara Jinan: Naheda Abdo

Komeleya Swêdî -Kurdî li Uppsala, di 21.1.2001ê de kongreya xwe ya salane pêk anî.

Kongre organên xwe yê nû helbijart. Ji Komîteya Peywendîyên Navxwe Rehman Hesen beşdarîya Kongrê bû û li ser navê federasyonê axaftinek pêşkeşî kongrê kir.

۱- (مهیمون) ی دیری ۴ بکرئ به (مهیمون).

۲- له بری وشهیه (مۆز) که له شوینی دیکه شدا به کار هاتووه، وشهیه دیکه به کار بهینریت چاکتره، وهک (مشک، مار، مانگا، میرووله، مایین، مریشک، مانگ، مهشکه).

۲۲: باشه (ئالاکت) لابردووه، به لام به راستی ئه (من مندالم) هیش زور ناریکه و کیش و موسیقای لهنگه. دهکرئ له بری ئهوه شیعریکی دیکه دابنری، که به سهر یا به زمانی منداله وه وترابی و پیشم وایه له و بابه تانه زور هه. بۆ نمونه:

ئیمه مندالی جوانین ناواتی نیشتمانین

شادمان و کامه رانین که نهوهی کوردستانین

رۆلهی خاکی پیروژین بویه هینده بهسوزین

ئهو شیعره وهک گۆرانیش هیه. ئه لیهت من هه ئه وهندهی لئ دهزانم، به لام بۆخۆی زیاتره، ئه گهر هه ولدهی رهنکه دهستت بکهوئ.

۲۴: پیم وایه وشهیه (سهربان) هه لیهکی بلاویوهیه، چونکه سهر = بان. وشهیه ۹ بان ۸ گهر میان به کار دهبریت و که دهلین (له بان میزه که) یانی (لهسهر میزه که) یا که دهلین (بانی خانوو) یانی (سهری خانوو) یا (به بان چاو) یانی (بهسهر چاو). بیججه له وهش زور نووسهری گهرم دینوو که بۆ وشهیه (سهربان) هه ر دهنووسن (بان).

۲۶: وشهیه (کاتی) زیادهیه.. (که له کوردستان بووم..) باشتره. (هه لۆزه) بکرئ به (هه لۆزه).

۲۷: (تابان) فارسییه، بکرئ به (تارا، تهوار، هتد) باشتره.

۳۱: له بری (سابوونی رهقی) من (نانه رهقه) م بیستووه، یانی تهنی سهردیژه که و یه کهم بهیت دهگۆردی و وای لئ دئ: نانه رهقه پشته تهته. پیم وایه بهم شیوهیه پش باشتر له گه ل کیشی شیعره که دا دهگونجی. من خۆم به مندالی ئه و یارییه م کردووه. دوو مندال پشت دهکه نه یه کتر و قۆل له قۆلی یه کتر دهکه ن و یه کتیکیان داده چه میته وه و یه کتیکیان بهرز ده بیته وه و ئه و جا ئه و ی دی داده چه میته وه و ئه و ی دی بهرز ده بیته وه و به و جۆره یه کدی له سه ر پشتی خۆیان هه لده گرن و له گه ل هه ر داچه مینه وه و بهرز بوونه و یه که دا یه کتیکیان یه کهم بهیت دهلی و ئه و ی دی دووه م بهیت، ئه گهر وینه یه کی وای بۆ دابننی باشه.

۳۵: (ئاورنگ) بکرئ به (ئاورینگ) یا (ئاونگ).

۳۶: (پیشانی) بکرئ به (پیشانی) که له (پینیشاندان) هوه هاتووه، نهک (پینیشان). وشهیه (لئ ی) بکرئ به (لئی) و بهسه ریه که وه بنووسریت.

۴۱: (یاری مان) بکرئ به (یاریمان). (له به رده می) بکرئ به (له بهر). (له بهر بارانه که یارییان ده کرد؟) بکرئ به (له بهر باران یارییان ده کرد؟)، چونکه وشهیه (بارانه که) له وئ یه ک باران دیاری دهکات و دهگه یهنی، به لام (باران) به گشتیه. (نا، له بهر بارانه که یاریمان نه ده کرد) ئه و (بارانه که) یه بکریت به (باران). ۴۵:

۱- (من به فرۆکه هاتم بۆ سوید..)، (سوید) هه که ی بکرئ به (سوید) و ئه و (،) یه بکرئ به (،) نوخته.

۲- (کاتی شهش سال بووم..) بکرئ به (ئه و کاته شهش سالان بووم)، چونکه کورد دهلی (شهش سالان بووم) یا (ته مه نم شهش سال بووم)، یا بکرئ به (کاتیک که شهش سالان بووم) یا (که شهش سالان بووم) یا (که ته مه نم شهش سال بووم) و ئه و رسته یه ش بخریته پیش (من به فرۆکه هاتم بۆ سوید).

۴۶: (جادوگر) بکرئ به (جادوگر)، ۵۰:

۱- (به رخ ناژه لیکه مالی یه..)، رسته که راسته، به لام به رخ بویه مالییه چونکه دایکی که (مه ره) مالییه. وهک ئه وه وایه بلئی: تووتکه ناژه لیکه مالییه. به چه پشیله ناژه لیکه مالییه. جاشه که ناژه لیکه مالییه. جووجه له پالنده یه کی مالییه. ئه لیهت ئه گهر سهگ و پشیله و کهر و مریشک مالی نه بن، تووتکه و بیجووه پشیله و جاش و جووجه له، مالی نابن. به لام تو مه به سست (خ) هه که یه، دنا توژیک لاوازه.

۲- (دارخورما) بکرئ به (خورما)، ۵۱، ۵۹:

۱- (هه ندئ جار خه ویان..)، (هه ندئ جار له خه ومدا..)، وشهیه (خه و) که بۆ (Dröm) دانراوه، بکرئ به (خه ون)، چونکه (خه ون = Dröm)، به لام (خه و) یانی (خه وتن، نووستن). بیگومان هه ر خه لکی مه هابادیش بۆخۆیان وا دهلین، جگه له وهی که له نووسیندا (خه ون) و (خه و) له یه ک جیا دهکرینه وه. عه ره ب (نوم و حلم) به کار دین و له کوردیشدا (خه و و خه ون) هه ن.

۲- (هه ندئ جار له خه ومدا ده فرم بۆ لایان..)، پاش گۆرینی (له خه ومدا) بۆ (له خه ونمدا)، (له خه ونمدا) هه ر بکرئ به (له خه وندا) باشتره.

۵۴: (ئیمه له سه رت ناکه یین!)، نازانم مانای چیه. ئه گهر مه به ست یارمه تیدان و هاریکاریکردن و کۆمه ک بیئت، ئه و کورد نالی (له سه رت ناکه یین) به لکو دهلین: له سه رت ناکه مه وه! له سه رت ناکه ینه وه! له سه ری ده که مه وه! له سه رم ده کاته وه! له سه ری کردمه وه! له سه رمی کرده وه! له سه رمانیان کرده وه! له سه ریان ده که ینه وه! له سه رتان ده که ینه وه! ئیدی به و جۆره.

۵۶: من ئه و شیعره فۆلکلۆرییه م بهم شیوهیه بیستووه: حاجی له قله ق مار هات، ماری زهنگله دار هات، حوشت به قه تار هات... هه م هه یه، به لام من نایزانم، پیم وایه (ماری سهوز و سوور هات)

کتیبه که تم خویندهوه، دستخوشی و پیروزباییت لی دهکه م، هرچنده من کتیبی خویندنهوه که م نه خویندوه و هتهوه و واپندهچی ئەم کتیبهش راهینانی ئەو بیت، بهلام دهتوانم ئەم سه رنجانهی خوارهوه بخه مه بهرچاو و بنگومان بریاری سه رها و دوا بریاریش هر هی خوتانه.

۱- ئەگەر کتیبه که بۆ مندالی بچووکه - هیچ نه بی سه رها تا که ی- ئەوا: من ناوم... ده بیته گیروگرفت و مندال ده بی بنووسی: من ناوم... سه رکه وته، هیزویه. ئەو (ه، ه، ه، ه) (یه) تۆزیک ئاسان نییه، ئەگەر هر بنووسری: ناو: ئازاد، سه رکه وت، هیزو، پهنگه ئاسانتر بیت. ل: ۱.

۲- وشه ی (ئەوین) هر (ئەفین) هه که یه و کوردی لای خومان و زیتیر کوردی رۆژه لاتی کوردستان وایان لی کردوه و پهنگه هر به (ئەفین) بمینیته وه باشتر بیت. ل: ۹، ۱۸، ۲۲، ۲۴، ۲۶، ۴۱، ۴۲، ۴۵، ۵۵، ۷۳، ۷۹، ۸۱، ۸۴، ۸۹، ۹۳.

۳- مه بهست له وشه ی (زار) چیه؟ ل: ۵، ۱۲، ۲۲، ۲۸، ئەگەر به مانای (دهم) بیت، ئەوا: زاریکی رهش = ده میکی رهش، پهنگه باش نه بیت، ئەگەر به مانای (زاری) تاوله بیت، ئەوا ده بیت.

۴- له بری وشه ی (به راز)، وشه یه کی دیکه ی وه که (مه ر)، پهنگه باشتر بیت، چونکه له کورده واریدا به راز هر به کار نابه ن و پیم و نییه لیره ش له ماله کوردا، به راز، ئاسایی بیت! ل: ۱۲، ۱۴.

۵- وشه ی (گوئی) بگوردری به وشه یه کی دیکه، چونکه (ئ) ی گوئی بۆخوی له (وئ) = \bar{O} دا هه یه و دهنگی (وئ) = \bar{O} ییش بۆخوی دهنگی سه ره بخویه، هرچنده ئەو پینه و په رۆیه ی کوردیه چاره سه ری ته وای نییه. ل: ۳۳.

۶- وشه ی (دان)، بکری به (ددان) باشتره، چونکه ته نی له سلیمانیه دهگوتری (دان) و ته وای ناوچه کانی دیکه ی کوردستان ده لێن (ددان، دران، دگان، به لام (ددان) له هه موویان باشتره. ل: ۳۵.

۷- (مه یمون) بکری به (مه یمون) یانی به (وو) بنووسری. ل: ۸.

۸- (مه ره که زه رده)، پهنگه به کارهینانی وشه ی (زه رد) بۆ مه ر هر راست نه بیت، چونکه مه ری زه رد نییه. ده زانم له کتیبه کانی لای خۆمانیش وای نووسراوه، به لام هه له یه، مه ر ده کری (ره ش، سه ی، بۆر، چار، په ر... هتد) بیت و شوان ئەوانه باشتر ده زانیت و پهنگه لیره ش خه لکی په ر هه بن ئەوانه بزانت. ل: ۳۹.

۹- (دارو) هر (دارا) یه، پیم وای نییه ناوی و هه بیت، مه گه ر بۆ خۆشه و یستی یا بچووکرده وه بکری به (دارو). ل: ۴۲، ۵۵، ۶۱، ۸۹، ۸۴.

۱۰- (تابان)، فارسییه و بکری به ناویکی کوردی باشتره. ل: ۴۷، ۶۳.

۱۱- (نه نکم نان ده برژینیت به ته نور)، بکری به (نه نکم به ته نور نان ده کات) باشتره، چونکه وشه ی برژاندن بۆ (نان) زیاده یه و فرمان = فعل = Verb ییش له کوریدا ده که ویتته دواوه. ل: ۴۷.

۱۲- تیپی ک، گ به شیوه ی فارسی بنووسری باشتره، نه ک به شیوه ی عه ره بی که هه مزه یان له سه ره، ل: ۵۱، ۵۷.

۱۳- س + ک = سک، وشه ی (سک) ته نی له سلیمانیه به کار ده بری. له بری ئەوه بگوتری (زک)، پهنگه باشتر بیت، چونکه له هه موو ناوچه کانی کوردستان وای ده لێن. ل: ۵۲.

۱۴- وشه ی (بخوینه ره وه، پرکه ره وه، بخه ره.. هتد)، بکری به (بخوینه ره، پرکه ره، بخه.. هتد)، پهنگه باشتر بن. ل: ۵۸، ۶۱، ۷۹، ۸۰.

۱۵- گ + ل = گلا، بنووسری (گه لا) باشتره نه ک (گلا)، ئەگه ر له ویش مه بهست گ + شتیکی دیکه بیت، ئەوا وشه ی (گه لا) لا بری و بگوردری به وشه یه کی دیکه. ل: ۵۸.

۱۶- (ناورنگ) بۆخوی (ناورینگ) ه. (ناورینگ) مانگا ده دۆشی، راستره، چونکه (دۆشین) به مانای (شیردۆشین) دیت و ئەوه ش کاره که یه که (دۆشین) بیت، یانی (شیر) له گوانی مانگا

یا مه ر ده ره کریت و کاره که (العلمیه) دۆشینیه بی دهگوتری. ل: ۵۹.

۱۷- (هق ریوی ریوی..)، ئەگه ر به ته وای بنووسری، پهنگه سوودی زیاتر بیت. ل: ۶۳.

۱۸- (مقهست) له (مقص) ی عه ره بییه وه هاتوه و راسته له قسه کردندا به کار ده بری، به لام وشه ی کوردی له بری (مقهست) به کار بری، بنگومان باشتره، ئەلبهت وشه ی (قهچی، قاچی) کوردین و به مانای (مقهست) دین. ل: ۶۵.

۱۹- (ته له فیزیون) یا (ته له فزیون) راستتر له (ته له فیزیون)، چونکه ئیمه لای خۆمان وشه که به عه ره بی به کار ده بین و له به ر ئەوه ی عه رب (ف) یان نییه، ده یکه ن به (ف) و ئیمه ش هر له سه ر ئەو هه له یه رۆیشته وین. ل: ۷۲، ۸۲.

۲۰- (جادووگر) به (وو) باشتره له (جادوگر) به (و). ل: ۷۶.

۲۱- (نه نکم شیریه مانگا ده دۆشی)، راست نییه و بگوتری (نه نکم مانگا ده دۆشی)، چونکه کورد وای ده لێن. ل: ۷۹.

۲۲- (بۆیه چی، راوچی)، ئەو پاشگری (چی) یه له تورکییه وه هاتوه. بۆ (راوچی ل: ۸۴) گۆران (راوکه ر) ی به کار هیناوه. گۆران ده لێن:

چاوی نووقاند پرخه پرخ نووست تا راوکه ر وتی پخ

۲۳- (حاجی له ق له ق) بکری به: حاجی له ق له ق، باشتره. ل: ۸۵.

دێری: ۱۰، ۱۲، ۱۴.

۲۴- راسته لیره خه لکی کوردیش هه یه ناوی (ئیفه یه)، به لام (ئیفه) کوردی نییه. ئەگه ر ئەم (ئیفه) یه ی ئەم ده رسه بۆخوی سویدییه، ئەوا قهیدی نییه، به لام ئەگه ر کورده ئەوا بکری به ناویکی دیکه باشتره. ل: ۹۸.

۲۵- ته وای کرمانج و کوردی تورکیا و سووریا و سوؤفینیت و ئیرانیش - به ته سیری فارسی -، ده لێن (سوید)، (سوید) کوردی عیراق ده لێن و به ته سیری عه ره بی. پهنگه (سوید) هه که جوانتر بیت.

سه ره که وقتت ده خوازم. ئەمجد شاکه لی ۱۹۸۹/۱۱/۲

دوو سنی مانگیگ دوا ی ئەو راهینانی په لکه زێرینه یه و وه لامه که ی من، کتیبیکی دیکه م له مامۆستا سهروه عه زیزه وه بۆ هات بۆ پینداچوونه وه. ئەمجاره یان کتیبی خویندنه وه ی په لکه زێرینه بوو. ئەمیش هر وه که ئەوه ی پشوو هیچ زانیاری و په و شتیکی وای له گه لدا نه بوو و وه که جاری پشوویش په شنوووس بوو، ئەمجاره شیان پیندا چوو مه وه و تیبینی و سه رنجکه لیکم که هه بوون کردمن به نامه یه ک و بۆ سهروه عه زیزم نارده وه. وای له خواره وه وه که خۆی ده قه که ی بلای ده که مه وه و ناوی نامه ی دووه می لێ ده نیم (۷).

نامه ی دووه م:

به ریز سهروه خانم، ریز و سلوم، پاش خویندنه وه ی کتیبه که ت ئەم سه رنجانه ی خواره وه م هه بوون، هیوادارم ئەگه ر سوودمه ندیش نه بن، بریک رووناکی بخه نه سه ر کاره که و بواری ده مه ته قه و لێوردبوونه وه له کاریکی وادا، به رین و به رفراوانتر بکه ن. (ل) بۆ لاپه ره دانراوه: ل، ۱، ۳، ۵، ۶.

۱- هر وه که بۆ کتیبه که ی دی نووسیوووم، من وشه ی (دارو) م پی جوان نییه. وشه که به ئەسل (دارا) یه. (دارو) له کوریدا به مانای: (هه یه، هه یه تی) بیت و ئەگه ر بیی به (دارو) ده کاته: ده رمانی سه سام، زۆرجاران و زۆر مندال (ر) ی سه ووک به (ر) ده خویننه وه.

۲- راسته لای خۆمان وشه ی (قوتابخانه) رۆیشته وه و باوه، به لام وشه یه کی خۆش نییه و له (کتابی خانه وه) هاتوه، یانی (ئه هلی کیتاب) و (خانه) که ییش به مانای جینی ئه وان. ئەو (ک) هیش هر له هیه چه بووه به (ق)، وه که چون کرمانجی باکووری کوردستان ده یگۆرن. پیم وایه وشه ی (فیرگه) بۆ په ی سه ره تایی باشه و (خویندنگه ییش بۆ ناوه ندی و دواناوه ندی و بریک

پاشخانیکى بەلگەزىرىنە و پروژەى كىتئى خويندىنى كوردى زارۇكان

ئەمجد شاكەلى

(سەرنج: ئىمە كە ئەم بابەتە زمانەوانىيەتە بلو ئەكەينەو، مەبەستەمان روزاندن و پەرەپىدانی گىتوگۇ و ئىكۆلىنەوئەپە لە بوارەكەدا و مەرج نىە كە لەگەل را و بۆچوونەكاندا بىن و ھەلەكان راست بگەينەو بە گۆيرەى رەوشى زمانەوانىيە بەربانگ...)

ئۇى دادە روونە(۱)، نىوى گوتارىكى مامۇستا ھەمەسەئەيد ھەسەنە، لە ژمارە ۱۱۷ى سالى ۲۰۰۰ى گۇفارى بەربانگدا و لە پروبەلانى ۹-۱۱ و ۱۵-۱۸دا، بلو بووتەو. گوتارەكەى مامۇستا ھەسەن، گوتارىكى رەخنەبى و ھەلسەنگاندنىكى تەواوى بەرھەمەكانى مامۇستا سىروە عەزىزە، كە كۆمەلە كىتئىكىن بۇ مندالان نووسراون و ئامادەكاراون و ھەرگىرپداون. مامۇستا ھەسەن زۆر وردكارانە و وردبىنانە، ئەو بەرھەمانەى خويندووتەو و زىرەكانە تىببىنى و سەرنجەكانى خۇى لەسەر نووسىون. منىش ھەك كەسىكى ھاوپىشە و ھاوكارى -ئىزىكەى دە سالىك كارى مامۇستايىم كردووە- مامۇستايان ھەمەسەئەيد ھەسەن و سىروە عەزىز، ھەم كىتئەكانى مامۇستا سىروە عەزىز و ھەم گوتارەكەى مامۇستا ھەسەنم خويندوونەو و لەلاشم مەبەست بوون. مامۇستا ھەسەن لە گوتارەكەيدا لىزانانە، ھەم كەلەن و جەوتى و ھەلەكانى كىتئەكانى مامۇستا سىروە عەزىزى دەستنىشان كردوون و ھەمىش راستى و دروستىيەكانى. من نووسىنەكەى مامۇستا ھەسەنم كۆلىك پى جوان و باش و تۆكمەپە، دەستخۆشى لى دەكەم و ئومىدەوارىشم ھەموو نووسىنىك، مامۇستا ھەسەن ئاسا، بۇ دەرخستنى راستىيەكان و ھەرامدانەوئەى پرسىيارەكان، رەخنەگرانە بخويندوونەو و ھەلبەسەنگىندى و بخرىتە بەر باس و دەمەتەقە، گوتارەكەى مامۇستا ھەسەن ھانىدام، كە ئەم نووسىنە، ھەك روونكردنەوئەپەكى پىويست لەمەر ئەو بابەتەو، كە تاراپەك دەكرى ھەك پاشخانىك، بۇ كىتئەكانى مامۇستا سىروە عەزىز حىساب بكرى، بخەمە بەر چاؤ.

سالانى ھەفتاكان و ھەشتاكان، مامۇستايانى زمانى كوردى- كرمانجى خوارو(سۆرانى) - لە سوئد، كە دەرسىيان بە زارۇكى كورد دەگووتە، كىتئى ئەفولبى ئىبراھىم بالداريان-بىگومان ئىستاش ھەر واپە- ھەك بناخە و بنەمايەك بۇ فىزىكردىنى زارۇك، بەكار دەبرد. دواتر ھەندەك كىتئى دىكە، كە ھەر ھەموويان لەسەر بىرۆكە و شىوئە كىتئەكەى مامۇستا بالدار دانرابوون، پەيدا بوون، ھەك ئەو كىتئەكەى حىزبى دىموكراتى كوردستانى ئىران، كۆمەلەى زەحمەتكىشانى كوردستانى ئىران و ئىنتىشاراتى سەلاھەددىنى كۆمارى ئىسلامى ئىران، ھەلئ ئەمانە سىياسەتاوى كرابوون و ھەرىكەو دەپويست و دەپوئى زارۇكى بىگەردى پاكى فرىشتەئاسا بكا بە ئەندام و ھەوادار و چەكدارى حىزب و بىروباوئەكەى خۇى. لە پال ئەوانەشدا مامۇستايان بۇ خۇيان لەم كىتئى و ئەو كىتئى، گوتار و نووسىنيان فۇتوكۆپى دەكرد و بەكار دەبرد. بەھارى ۱۹۸۷، ئەو دەمى من مامۇستا بووم و لە باژىرەى كارلسكوگا (سوئد)، كارم دەكرد، سىف نوردىل Siv Nordell، خانمىك بوو بەرپرسى دەستگى/كارگىرەى خويندنگە بوو، بانگەئىشتنى جىقنىكى كردم لە باژىرەى ئوپسالا(سوئد)(۲)، لەو جىقنەدا باس لە پىويستى دانانى كىتئى خويندىنى زمانى كوردى، بۇ زارۇكانى كوردى سوئد كرا. پىكرا گەيشتنە ئەو ئەنجامەى، كە ھەول بەردى پىوئەند بە كەسانى دىكەى شارەزا و پسپۆر لەو بوارەدا بكرى و

ھەولى پىكەئىنانى كۆمىتەپەك بەردىت لەو كەسانە و ھەول بەردى بۇ ئامادەكردنى كىتئى بۇ سى پلەى خويندىن و جىقنى دىكەش لەو جۆرە بكرى و تەواوى مەسەرەفى ئەو جىقن و كىتئەبەش كارگىرەى خويندنگەكان وئەستۆى خۇى بكرى. ئەو ئەنجامانە ھەك پىشنىياز و پىشپىرپار لەلاپەن ئامادەبووانەو پەسەند كرا. ماوئەپەك پاش ئەو -ئەگەر بەھەلەدا نەچووم- بەھارى سالى ۱۹۸۸، ئەو دەمى من لە باژىرەى ستۆكھۆلم دەرس دەگووتەو، بانگەئىشتنى جىقنىكى دىكە كرام لە ستۆكھۆلم. بانگەئىشتنەكە لەلاپەن سىف نوردىل يا ماى بىيەر Maj Beijer ئەو بوو، كە ئەمەى داويشيان ھەر لە بوارى كارگىرەى خويندنگە و ئەوانەدا كارى دەكرد(۳). لەو روونىشتنەشدا ھەر ئەو باسانەى كە لە جىقنەكەى ئوپسالادا باسكرايون، بە مەسەلەى پىكەئىنانى كۆمىتەپەشەو بۇ دانانى كىتئىيان، ھىزانەوئە گۆرئ و جەختيان لەسەر كرانەو و پىرپارىيان لەسەر درانەو. لە جىقنىكى دىكەى كارگىرەى خويندنگە و ئامادەكردنى كىتئى خويندىنى زمانى كوردى بۇ زارۇكان، كە لە ۱۹۸۹/۱۱/۲۷دا كرا(۴)، برپارى دامەزراندنى دەستەپەكى راوئىژكارى بۇ كاركردن و بەشداربوون لە پروژەى دانانى كىتئى كوردى بۇ زارۇكان لە نىوان ۱۹۸۹/۱۱/۱۵-۱۹۹۰/۶/۲۰(۵). ماوئەپەك پىش ئەوئەش كىتئى كوردى(كرمانجى سەروو) ئەم بخوين Em Bixwinin بۇ زارۇكان چاپ كرا. ھەرچى كىتئە بە كوردى (كرمانجى خوارو/سۆرانى)، چ پرس و راوئىژىك بە ئىمە نەكرا و ئەو دەستەى راوئىژكارىيەش، كە بۇ پروژەى ئامادەكردنى كىتئىيان دامەزرىنرابو، تەئى لەسەر كاغەز بوو و من بەش بە حالى خۆم، بىجگە لە نامەى برپارى دامەزراندنى ئەو دەستەپە، كە لە نۆفەمبەرى ۱۹۸۹دا بە بوستدا بۆم ھاتبوو، نە كەس بانگى كردم بۇ بەشداربوون لە دانانى كىتئىدا و نە كۆمىتە ساز كرا و نە ھىچ، وا ديار بوو لە پىشتى پەردەو كارەكان بە جۆرىكى دىكە ئەنجام دەدرئ. ھەر لەو بەينەدا مامۇستا سىروە عەزىز رەشئووسى كىتئىكى بۇ ناردم، بۇ ئەوئە تەماشاپەكى بگەم و سەرنجى خۆمى لەسەر بەدم. كىتئەكە بىجگە لەوئە رەشئووس بوو، نە ناوى بەسەرەو بوو، نە وئەئە تىدا بوو، نە ھىچ زانىرپەكى-ھەك بۇ چ پلەپەكى خويندەنە بۇ مندالى چەند سالانە و ئەو شتانە- لەبارەو نووسرابو. ئەو رەشئووسە-ھەك دواتر زانىم- كىتئى راپەئىنانى بەلگەزىرىنە بوو. واتە پىش ئەوئە بە كىتئى خويندەنەوئەكەدا بچمەو، من بە كىتئى راپەئىنانەكەدا چومەو-چونكە سىروە عەزىز خۆى لە پىششدا ئەوئە بۇ ناردبووم و بى ئەوئە ھىچ روونكردنەوئەپەكىشى لەگەلدا بىت- كە شتى وا ھەرگىز ناىت و منىش بەگۆيرەى دىت و بۆچوونى خۆم و تىگەئىشتىم لى، سەرنج و تىببىيەكانم لە نامەپەكدا بۇ سىروە عەزىز نووسى و بۆم ناردەو. دەقى ئەو نامەپە لە خوارەو ھەك خۆى بلو دەكەمەو و ناوى نامەى پەكەمى لى دەنىم(۶).

نامەى پەكەم:

خوشكى بەرىز سىروە خانم، سالاؤ.

پووهوه. بوونی دهیان هزار کوردی خویندهوار له ئه وروپا و ئاشنايهتی و تیکه لاوییان له گه‌ل زمانه‌کاندا، زۆر له و کیشانه‌ی زمانه‌که‌مان دهرئه‌خات و هه‌روا به ئاسسانیییش چاره‌سه‌ره‌کمان و را و بۆچوونه‌کمان بۆ هه‌رس ناکریت، له‌وانه‌ش کیشه‌ی (ی)یه، هه‌رچه‌نده له ژماره‌یه‌کی پینشووتردا ئاماژه‌مان بۆ کردووه، به‌لام ئه‌وه سه‌ره‌تایه‌ک بوو، هیشتا زۆری تری پینووسته له‌سه‌ری بدوین.

ناوی مانایی (معنوی) ئه‌و ناوه‌یه که به هیچ کام له هه‌سته‌کان هه‌ستی پیناکریت و به‌لکوو بوونی به هۆی (دهرون، هۆش و خه‌یال)هوه‌یه، هه‌ر وهک (دهرون، هۆش و خه‌یال) که شتیکی جه‌سته‌یی نین، واته بوونیکێ فیزیکیان نیه.

ئهم جـۆره ناوه به هۆی خسته‌سه‌ری پاشگر بۆ سه‌ر ناو دروست ئه‌بیت، به هه‌موو جۆره‌کانی ناوه‌وه (ناوی ساده، لیکدراو، داریژراو (ناو + پاشگر، ئاوه‌لناو + ناو، په‌گی کـردار + پاشگر، ئاوه‌لکردار + پاشگر و ... هتـد)) هه‌روه‌ها ئاوه‌لناو و ئاوه‌لکردار. ئه‌وه‌ی که لێردها مه‌به‌سته ئه‌و پاشگرانه‌یه که به (ی) کۆتاییان دیت، دکتۆر ئه‌وره‌حمانی حاجی مارف له کتیبی (پیزمانی کوردی به‌رگی په‌که‌م، مۆرفۆلۆژی، به‌شی په‌که‌م، ناو)دا، جوانترین وه‌سفی ئهم جۆره پاشگرانه‌ی کردووه و ئه‌لئ (پاشگری (ی) و هتی/یتی، ایه‌تی، یتی) ناوی مه‌عنه‌وی دروست ده‌که‌ن، ئه‌و جـۆره ناوانه‌ش مانای ته‌جرید (ئه‌به‌ستراکت) ده‌به‌خشن و واتای نه‌وعیه‌ت و خاسیه‌ت و بار و جۆری چالاکي... یان تێدایه).

هه‌رچه‌نده دکتۆر ده‌ربهرینه‌که‌ی زیاتر به عه‌ره‌بییه، به‌لام مه‌به‌سته‌که‌ی ئاشکرایه و مه‌به‌ست له شێوه و جۆری پیشه و سه‌رده‌مه

(ناوی کات، مندال - مندالی، گه‌نج - گه‌نجیتی).

هه‌ندیک له زمانناسانمان پاشگری (ی) و (یی) به دوو پاشگری سه‌ره‌خۆ دا ئه‌نین، به‌لام هه‌ندیکێ تر لایان وایه که هه‌ردوو پاشگره‌که په‌کن و ئه‌ویش هه‌ر (ی)یه، له کاتیکدا که زۆربه‌یان له نوسینه‌کانماندا (بی) به‌کار ئه‌هێنن و به هیچ جـۆریکیش باسی ئه‌و به‌کاره‌ینانه ناکه‌ن.

دکتۆر ئه‌وره‌حمان له کتیبی ناوبراوا له‌م پووهوه ره‌خنه له مامۆستا نوری عه‌لی ئه‌مین ئه‌گریت و ئه‌لئ دوو پاشگری (ی) و (یی) له (ئاشه‌وانی و ساوایی)دا هه‌ر په‌کن و (ی)یه، به‌لام مامۆستا له‌مه‌دا به هه‌له‌ چووه که به دوو پاشگری جیا دایان ئه‌نیت.

ئه‌وه‌ی شایانی سه‌رنجه دکتۆر له‌و کتیبه‌یدا به ده‌یان جار پاشگری (بی) به‌کاره‌یناوه له‌گه‌ل ناوی ماناییدا، به‌لام بۆ ته‌نیا جارێکی له‌و کتیبه‌ گرنکه‌دا باسی ئه‌وه‌ی نه‌کردووه بۆچی هه‌ندیک جـۆر (ی) به‌کار ئه‌هێنیت و جار جارێش (بی)، هه‌روه‌ک: کورتیی و زۆر جارێش کورتی، هه‌روه‌ها کرمانجیی، فارسیی، ناسیاوی، زانیاریی، ناته‌واوی، و ... هتـد.

من پیم وایه که ئه‌و دوو په‌ره‌کی و کیشه‌یه‌ی له‌سه‌ر (ی) و (بی) هه‌یه، ئه‌مرۆ زیاتر پێگه‌یشتووه و رون بووه‌ته‌وه، ئه‌ویش ئه‌وه‌یه که پاشگری (بی) راست و په‌وانه و (ی) به ته‌نیا پۆلی (ئامـراز)ی په‌یوه‌ندی، خسته‌سه‌ر (ئیزافه)، ته‌واوکه‌ر و ده‌رخستنی دیارخه‌ر و دیارخراو... ئه‌به‌ینیت و (بی)ش پاشگری ناوی ماناییه.

ئاسن (ناویکی جه‌سته‌یه - ماتیریاالییه) + گه‌ر (پاشگره) = ئاسنگه‌ر (ناویکی داریژراوه) و ناوی که‌سـیکه، به‌لام (ئاسنگه‌ری)

ناویکی ماناییه و شێوه‌یه‌کی پیشه‌یه، هه‌روه‌ها دانسازیی، دارتاشیی ...، ئه‌گه‌ر ئه‌مانه به په‌ک (ی) بنوسرین ئه‌وا به ته‌نیا مانا نابه‌خشن. ئه‌بێ ئه‌مرۆ کئ هه‌ست به‌وه نه‌کات که جیاوازیی نیوان (ئاسنگه‌ری کورد پیش نه‌که‌وتووه) له‌گه‌ل (ئاسنگه‌ری کورد پیش نه‌که‌وتووه)، جیاوازیی نیوان زه‌وی و ئاسمانه! په‌که‌میان مه‌به‌ست له ناوی که‌سـیکه که ئاسنگه‌ره و دووه‌میان مه‌به‌ست له پیشه‌یه‌که که (ئاسنگه‌ری)یه. ئه‌گه‌ر له هه‌ردوو په‌سته‌که‌دا په‌ک (ی) به‌کار به‌ینن، ئه‌وا وه‌ک مه‌ته‌لئ لیدیت و مه‌گه‌ر له چیرۆکیکدا بزانیته مه‌به‌ست له مۆفه‌که‌یه یان پیشه‌که.

لێردها، ئه‌وه‌ی جیی داخه ئه‌وه‌یه که زۆر که‌س به نا‌په‌وا، (ی) په‌ک زیاد ئه‌که‌ن بۆ ئه‌و ناوانه‌ی که خۆیان له خۆیاندا به پاشگریک کۆتاییان دیت که (ی)یه و ده‌نگه‌کان ئاشکران و هیچ پینووست به زیادکردنی (ی) په‌کی تر ناکات، وه‌ک (پیاو + هتی، په‌ک + یتی، کورد + ایه‌تی، برا + په‌تی، کچ + ینی، پان + ایی، بۆیاخ + چی، سارد + مه‌نی، سه‌ر + هکی، ...)، من پیم وایه که ئهم کاره یا له نه‌زانینه‌وه‌یه یان له شێواندنه‌وه، ئه‌وه‌ی زیاتر پی تیده‌چیت نه‌زانینه‌که‌یه، چونکه ئه‌مرۆ بارودۆخیک دروست بووه، هه‌رچی پینوسیک بگریته ده‌ست، و نه‌زانیت نوسه‌ره و شاره‌زای زمانه‌که و پیزمانه‌که‌یه‌تی، به‌لام هه‌ردوو دۆخه‌که هه‌ر زیان به‌خشن.

ناوی مانایی و کیشهی (ی)

مهرداد دولی

ئەمینیتهوه (د) ، ئەمیش ناتوانی بە تەنیا دەربەری ناویک بیت کە دەیه بۆیه وەک بزۆینهکانی تر (ی) و پاشگری (ان) وەرئەگریت، هەلبەتە ئەم باسە لەوه زیاترە کە وا بە چەند نمونەیک بە سەریدا تێپەرین ، بەلام لێردەدا مەبەستم ئەوهیه کە (ان) نیشانەیی کۆیه نەک (ین) وەک ئەمرۆ ئەیبینین کەسانیک بئ بەزەییانە چەند - چەندان ئەکەن بە چەندین ، بەراستی سەیرە!!!

ناو بەشیکە لە بەشە هەرە گرنەگەکانی ریزمانەکەمان و دەیان لیکۆلینەوهی لەسەر کراوه و دەیان کتییی لەسەر نوسراوه ، بۆیه ناگرئ بە دوو لاپەرەیی گۆفاریک باسی هەموو (گون و کە لەبەری) ئەم باسە گرنەگە بکەین ، ئەوهی ئیمە لەم گۆشەیهی گۆفاره کەماندا مەبەستمانە ، ئەوهیه کە بتوانین گفتوگۆی کیشە زەقەکان و هەلە گەورەکانی زمانەکەمان بکەین و بە شیوهیهکی زانستییانە چارەسەریان بۆ بدۆزینەوه ، بە مەرجیک کە بەهیزکردن و دەولەمەندکردن بیت نەک زیاتر شیواندن.

دەنگ ، واتە دەنگی پیتەکان لە زۆرەیی زمانە ئەرۆپاییەکاندا بە بەشیک لە ریزمان ئەژمیرریت ، بەلام زمانناسانی ئیمە هیشتا لەسەر ئەوه ریک نەکەوتوون ، هەلبەتە کاریگەری زیاتر لە زمانیک (عەرەبی، فارسی و تورکی) لەسەر زمانەکەمان وای کردووه کە نەتوانین بە ئاسانی بریار بدەین لەو

لەبەر چاویانەوه زۆر بئ بەزەییانە زمانەکەمان ئەشیوینریت و بناغەکانیشی ئەروخینرین.

بە کئ پەوايه (ژمارە)ی ناو لە بری بە (ان) کۆبکریتهوه ، بەلام ئەمرۆ لە سایەیی (بەرەلایی نوسیندا) بە (ین) کۆئەکریتەوه! لە زمانی ئیمەدا (ان) بە شیوهیهکی گشتیی نیشانەیی کۆیه (ئەمە باسیکی فراوانە ، بۆیه لێردەدا تەنیا باسی (ان) ئەکەین) ، وەک: شار- شاران ، دایک - دایکان ، باوک - باوکان ، بەلام ئەگەر ناوهکە بە پیتیکی بزۆین کۆتایی بیت ئەوا پیتی (ی) بۆ زیاد ئەکریت ، وەک: برا- برايان ، هەرمی - هەرمیيان ، دۆ- دۆيان ، هەلۆ - هەلۆيان ... هتد. بۆ ژمارەیی ناویش هەر بەو جۆرەیه ، وەک: سەد- سەدان ، هەزار- هەزاران ، میلیۆن - میلیۆنان ، ((چەند- چەندان)) نەک (چەندین)!!!

ئەم ریسایەش وەک لە هەموو زمانیکی تردا لادانی تیا دایە ، ئەویش بەوهی کە ئەگەر ناوهکە بە بزۆینیکی کپ (کورت) کۆتایی بیت ئەوا تەنیا (ان) وەرئەگریت ، وەک: پیاو- پیاوان ، خو ئەگەر بە بزۆینی (ه) کۆتایی بیت ئەوا بزۆینەکە (قوت ئەدریت) ، وەک: لاپەرە - لاپەرەن (ئەو لاپەرەنە) ، بەرە - بەرەن (ئەو بەرەنە) ، پارە - پارەن (ئەو پارەنە) ... هەرچەندە سەرپێچییەکیش لەم لادانەشدا هەیه ، وەک: ژمارە (دە) - دەیان ، لێردەدا بزۆینەکە ون نەبوو ، ئەویش لەبەرئەوهیه کە ئەگەر بزۆینەکە بروت ، ئەوا هەر یەک پیت

من پیم وایە نوسین وەک موسیقا وایە ، ئەلف و بی موسیقا ئەکرئ بلین بە گشتیی حەوت پیتە (دۆ، رئ، می ، فا، سۆل ، لا، سی) ، ئەگەر بە گۆیرەیی ریسایەک ئەو پیتانە و دەنگە تەواو و نیودەنگەکان ریک نەخرین ، بیگومانە کە ئاوازیکی ناساز دەرئەچیت.

کئ لە ئیمە جاریک لە چاران بیزار نەبووه لە ژەنینی ئامیریک لە لایەن کەسیکەوه کە شارەزای موسیقا و دەنگەکان نەبوونیت! هەر بەم جۆرەش هەموو نوسینیک نوسین نیە ، بە هەلە دانانی پیت و وشە و گوئ نەدان بە دەنگەکان و ریساکانی ریزمان و رینوس ، هەر وەک ئەوه وایە کە مندالیک یان نەزانیک ئامیریکی موسیقا بژەنئ.

ئەمرۆ خویندەوارمان زۆرە ، بەلام مەرج نیە هەموو خویندەواریک توانای نوسین و شارەزایی هەبیت لە زمانەکەدا ، لەگەل ئەوهشدا ئەمرۆ هەزاران کەس دەستیان داووتە نوسین و (شەلم کویرم ، ناپاریزم) چۆنیان بۆ بلویت وشە ریز ئەکەن و وشە (دائەتاشن) و تەنانت هەندیک وشە و زاراوه (سەرئەبیرن) ، داخی گرانیش لەوه دایە کە ئەم پەتایە دەزگاکانی راگەیانندی کوردستانی گرتووتەوه و بە شیی ووهیهکی بەربلاو و لە پەرەسەندیشدایە.

نازانم چۆنە ئەو مامۆستا بەریزانە بێدەنگن کە (چەندان) نەوهیان پینگەیان دووه و دەیان سالە بنچینەیی ریزمانەکەمان دائەنن و ئەمرۆش

بەو پێناسەییە، لە گەشتوگۆی شارستانییهتە جیاوازه‌کان و کۆمه‌لگا و حکومه‌تی مه‌ده‌نی، پێویسته‌ ناماژه به‌و راستییە بکه‌م که چه‌مک و تیوری و واقعیه‌تی کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی دیارده‌یه‌کی نوێیه له ژبانی کۆمه‌لایه‌تی و سیاسی گهلانی دانیشتووی ئێراندا. بۆیه هه‌موو ئه‌و نوسه‌ر و رۆژنامه‌نوس و که‌سایه‌تیانیه‌ی که له ئێراندا بۆ ئه‌و مه‌به‌سته هه‌ول ده‌ده‌ن، ناتوانن خۆیان له‌به‌ر زه‌بری جه‌لادانی کۆماری ئیسلامییدا بپاریزن و هیچ یاسا و پرسیاره‌یه‌کی نیه له ئێراندا که داکوکی له مافی کۆمه‌لایه‌تی و سیاسی ئه‌وان بکات. سه‌رۆک خاته‌میش که شیعه‌ی ۱۲ ئیمامه و باوه‌ری به ویلایه‌تی فه‌قی هه‌یه و بۆ په‌ره‌پێدانی له ئێران و جیهاندا هه‌ول ده‌دات، ناتوانی هه‌لگری دروشمی به مه‌ده‌نییه‌ت کردنی حکومه‌ته‌که‌ی بیته و باسه‌که‌ی له چوارچێوه‌ی ناساندنی شارستانییه‌تی شیعه‌گه‌رییدا ده‌مینیته‌وه.

پیشه‌یی و خزمه‌تگوزاری گه‌شتی دامه‌زراوه، که هه‌موویان به یارمه‌تی ئابوری حکومه‌ت و شاره‌وانییه‌کان ده‌ژین. ئه‌و کۆمه‌لانه لایه‌نیکی به‌هێزن له به‌ره‌وه‌پێشه‌وه بردنی باری کۆمه‌لایه‌تی سوید و زه‌فکردنه‌وه‌ی ویست و خواستی دانیشتووان و گه‌شه‌پێدانی مه‌ده‌نییه‌ت له سویددا.

سیستمی تاکه حیزبی، ده‌سه‌لاتدارییه‌تی پاشایه‌تی و سیستمی ئیسلامی که بنه‌مای له‌سه‌ر ویلایه‌ت دامه‌زراوی، دوژمنی سه‌ره‌کی کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی و دیموکراتی و پلورالیزی سیاسین. له‌به‌رئه‌وه، هه‌تا یاسای بنه‌ره‌تی ئێران له‌سه‌ر بنه‌مای ویلایه‌تی فه‌قی بمینی، ناتوانن بلێن دیموکراتی و مه‌ده‌نییه‌ت له ئێراندا هه‌یه، یاساکانی ئه‌مرویان رینگا ناده‌ن به‌و ده‌زگا دیموکراتیانه که بۆ گه‌شه‌پێدانی کۆمه‌ل و به مه‌ده‌نییه‌ت کردنی کۆمه‌ل و سه‌ره‌نجام دامه‌زراندنی حکومه‌تی مه‌ده‌نی تێده‌کوژن له ئێراندا.

ئالاه‌لگری بیرى نوێی کۆمه‌لی مه‌ده‌نی و حکومه‌تی مه‌ده‌نین، ئه‌وان له‌و بواره‌دا زۆر هه‌نگاوی به‌نرخ‌یان ناوه، به چه‌شنیک ئه‌مرو دوو دوژمنی سه‌ره‌کی مرۆفایه‌تی واته شه‌ر و برسییه‌تی هه‌ره‌شه له دانیشتوانی ئه‌و دوو هه‌ریمه‌ی جیهان ناکه‌ن و بۆ ریزگرتن له مافی تاک و کۆمه‌لێش به میلیۆن ده‌زگای کۆمه‌لایه‌تی، کولتوری، پیشه‌یه‌ی، سیاسی له‌و ولاتانه‌دا دامه‌زراوه، تا به شیوازی زانستی بیر و ویستی دانیشتوان زه‌ق بکه‌نه‌وه و جه‌خت له جیبه‌جی کردنیان بکه‌ن. هه‌روه‌ها له‌و دوو هه‌ریمه‌ی جیهاندا، ریکخراوه سیاسییه‌کان به گۆزه‌ی ده‌نگی هاوولاتیانیان به حکومه‌ت ده‌نگن، حکومه‌تیک که مه‌رج و سنوری بۆ دانراوه و ناچاره به گۆزه‌ی یاسا و به قازانجی دانیشتوان هه‌لسوکه‌وت بکات. بۆ وینه، له سوید که دانیشتوانی هه‌شت میلیۆنه، پتر له دووسه‌ده‌زار کۆمه‌لی کولتوری،

تیرۆر گه‌لی کورد ناترسینی



فره‌نسۆ هه‌ریری 2001-1937

له مۆنتاژی ئه‌م ژماره‌یه‌ی به‌ربانگ بپوویته‌وه، که هه‌وائی تیرۆرکردنی تیکۆشه‌ری ماندوویی نه‌ناس کاک فره‌نسۆ هه‌ریری مان پیکه‌یشت، به‌ده‌ستی دوژمنانی گه‌له ستم‌دیده‌که‌مان و ئاساییش و ئاشتی و ئه‌زمونه‌که‌ی. کاک فره‌نسۆ هه‌ریری ئه‌ندامی کۆمیته‌ی ئاوه‌ندی پارتی دیموکراتی کوردستان بوو. هه‌روه‌ها ئه‌ندامی په‌رله‌مانی کوردستان و وه‌زیریش له کابینه‌ی سییه‌مه‌دا و سه‌رۆکی فراکیۆنی پارتی بوو له په‌رله‌مانی کوردستاندا. فیدراسیۆنی کۆمه‌له کوردستانییه‌کان له سوید و ده‌سته‌ی نوسه‌رائی به‌ربانگ ئه‌م تاوانه چه‌په‌له به توندی ریسوا ئه‌که‌ن و به داخ و په‌ژاره‌یه‌کی زۆریشه‌وه سه‌ره‌خۆشی له بنه‌ماله‌ی خوالیخۆشیو ئه‌که‌ین، هه‌روه‌ها له سه‌رکردایه‌تی پارتی دیموکراتی کوردستان، په‌رله‌مانی کوردستان و دۆست و ئاشنایانی. هیوادارین به زووترین کات تیرۆریسته‌کان ده‌ستگیر بکړین و به سزای ره‌وای خۆیان بکه‌ن و شه‌رمه‌زار ریسوای گه‌لی کورد و ئاشوری ببن.

گفتوگۆی شارستانییه ته جیاوازه کان

حامید گوهه‌ری



پنویستییه‌کانی ژبانی کۆمه‌لایه‌تی و ئابوری، به دیموکراتیزه‌کردنی کۆمه‌لگا به‌ره‌و مه‌ده‌نییه‌ت و دامه‌زراندنی حکومه‌تی مه‌ده‌نی هه‌نگاو ده‌نی، له ئه‌نجامی ئه‌و ره‌وته‌دا، ریک‌خراوه کۆمه‌لایه‌تی، کولتوری، پیشه‌یی و سیاسیی‌ه‌کان نوێ ده‌کرتنه‌وه. له هه‌لبه‌راوه‌ی ئازاد و دیموکراتیییدا، حکومه‌تی زۆرینه، یان تیکه‌لاو داده‌مه‌زرێ و کۆمه‌لگا به‌ شیوه‌ی دیموکراتیی له‌ قالم ده‌دریته‌وه و یاسا به‌ دیسپلینی دیموکراتیی مافی کار و ژبانی تاک و کۆمه‌ل ده‌باریزێ و کۆنترۆل ده‌خاته‌ سه‌ر هه‌موو لایه‌نه‌کانی ژبان.

کۆمه‌لی مه‌ده‌نی به‌ واتای دیموکراتیی فره‌ریک‌خراوه‌یی، پلورالیزی سیاسی و حکومه‌تی په‌رله‌مانیی، به‌ گۆیهری به‌ره‌پیتشچوونی جیهان، گه‌شه‌ ده‌ستینێ، له‌ سه‌رده‌می کۆندا، یونانییه‌کان ئالاهه‌لگری مه‌ده‌نییه‌ت بوون، به‌لام له‌ سه‌ده‌ی بیستم و به‌ تایبه‌تی له‌ په‌نجا سالی رابوردوودا، ئه‌وروپای رۆژئاوا و ئه‌مریکا پیتشهره‌و و

ژبانی شارستانییه‌ته‌وه. به‌لگه‌نامه مینرووییه‌کان ئه‌وه ده‌سه‌لین که کوردستان له‌ سه‌رده‌می سۆمه‌رییه‌کانه‌وه پینی ناوه‌ته قوئاغی شارستانییه‌ته‌وه و له‌ سه‌رده‌می ئارییه‌کانیشدا لایه‌نیکی گرنگ بووه له‌و پیکهاته له‌ ئیراندا.

هه‌رچهنده کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی و شارستانییه‌ت دوو دیارده‌ی لیک جیاوازی گرێدراو به‌ یه‌کترن، به‌لام باس له‌ شارستانییه‌ته جیاوازه‌کان به‌و مانایه‌ نیه که له‌ ئیراندا کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی جیتی گرته‌یی و خاته‌می ده‌یه‌وئ له‌ چه‌مک و ئه‌زمونه‌کانی ئه‌و دیارده‌یه باس و گفتوگۆ بکات.

کۆمه‌ل له‌ سه‌ر بنه‌ما و بنچینه‌ی تاک دامه‌زراوه و هه‌ر که مرۆف له‌ کۆمه‌ل ده‌دوێ، به‌ شیوه‌ی سروشتیی بیر له‌و تاکانه ده‌کاتوه که بوونه‌ته هۆی پیکهاتنی کۆمه‌ل. خه‌زان یه‌که‌م ده‌سکه‌وتی به‌ کۆمه‌ل ژبانی مرۆفه. له‌ یه‌کگرتن و به‌ کۆمه‌ل ژبانی خه‌زان و ژبانی هاو‌به‌شیی بنه‌ماله‌کاندا، کۆمه‌ل به‌ره‌و شارستانییه‌ت هه‌نگاوی هاو‌یشتوو و شارستانییه‌ت ره‌چه‌له‌کی راسته‌قینه‌ی مرۆفه، که هه‌موو به‌شه‌کانی ژبانی کۆمه‌ل ده‌گرته‌وه، له‌ کاری رۆژانه‌وه بگه‌ر هه‌تا ده‌گاته‌ چالاکییه‌کانی کولتوری و هونه‌ری، شیوه‌ بیرکردنه‌وه‌کانی ئایینی، ده‌ستکه‌وته‌کانی ته‌کنیکی و زانستی و... هتد. به‌ر واتایه که هه‌موو نه‌ته‌وه‌کانی سه‌ر زه‌وی خاوه‌ن شارستانییه‌تن، به‌لام له‌ هه‌موویاندا مه‌ده‌نییه‌ت پیک نه‌هاتوه و ته‌نانه‌ت هه‌ل بۆ به‌ش‌تیکه‌یان نه‌ره‌خساوه که ده‌وله‌تی ناسیۆنالی خۆیان دامه‌زرین.

شارستانییه‌ت به‌هۆی

کۆتایی هاتنی جه‌نگی هه‌شت ساله‌ی نیوان ئیران و عیراق و هیور بوونه‌وه‌ی رێبه‌رانی کۆماری ئیسلامیی له‌ نارده‌ی به‌ زۆره‌ملینی شۆرش (صدور انقلاب) بۆ ولاتانی دراوسیی و به‌تایبه‌تی، له‌و رۆژه‌وه که محمه‌د ره‌زا خاته‌می به‌ سه‌رۆکایه‌تی کۆماری ئیسلامیی ئیران هه‌لبه‌راوه، چه‌مکی کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی و دامه‌زراندنی حکومه‌تی مه‌ده‌نی له‌ ئیراندا بووه‌ته دیارده‌یه‌کی به‌رچاو و به‌ به‌رده‌وامیی له‌ رۆژنامه‌کانی ئیراندا باس ئه‌کریت و وناری جۆراوجۆری له‌ سه‌ر بلاوده‌بیته‌وه. له‌ ژیر کاریگه‌ریی ئه‌و دیارده‌یه‌دا، سه‌رۆک کۆمار خاته‌میش، دروشمی (گفتوگۆی شارستانییه‌ته‌کان) ی به‌رز کردوه‌ته‌وه و بۆ دامه‌زراندنی ئه‌و په‌یوه‌ندییه جیهانییه داوای له‌ ریک‌خراوی نه‌ته‌وه‌یه‌که‌گرتوه‌کان کرد که زه‌مینه‌ی ئه‌و گفتوگۆیه له‌ چوراچیوه‌ی ده‌وله‌تانی جیاوازی جیهاندا خۆش بکات و سالی 2001 به‌ سالی گفتوگۆی شارستانییه‌ته‌کان بناسێ.

رۆژنامه‌کانی سه‌ر به‌ لایه‌نی چاکساز و به‌ تایبه‌تی خاته‌می، به‌ دوویات کردنه‌وه‌ی ئه‌م وشانه و ئاماژه‌ی په‌یتا په‌یتایان به‌ گفتوگۆی شارستانییه‌ته جیاوازه‌کان له‌ دنیا، و پیتشاندنه‌دن که دروشمی سه‌رۆک خاته‌می ره‌نگدانه‌وه‌ی کۆمه‌لگای مه‌ده‌نی و حکومه‌تی مه‌ده‌نییه له‌ ئیرانی ئیسلامییدا.

گومان له‌وه‌دا نیه که گه‌لانی جیهان به‌پینی کولتور و داب و نه‌ریتی جیاوازیان له‌ کۆنه‌وه خاوه‌ن شارستانییه‌تی جیاوازن و مرۆف هه‌زاران ساله پینی ناوه‌ته قوئاغی

ئاشتی و بۆمب

ۋە ھۆكۈمەتتى كوردستان ، بە سەرۆھرى ياسا ۋە ھەلۋەشاندىنە ھەي گروپە چەكدارىيە ھەمەجۆرەكان ۋە دامەزراندنى ھېزىكى چەكدارى نىشتىمانىيە لە ھەموو ھېزە نىشتىمانىيەكانى كوردستان ۋە داردەستى ھېچ لايەنك نەبىت ۋە ئەركى سەرەكى پاراستنى نىشتىمان بىت ۋە دورەپەرىز ۋە بىلایەن بىت لە كاتى ناكۆكىيە سىياسىيەكانى نىوان لايەنەكاندا .

سندوقى دەنگدان ئەبى خاوەن بېيار بىت لە يەكلەيكردە ھەي كېشەكاندا . رېزگرتنى مافى مروف بەگشتى ۋە ئافرەتەش بە تايپەتتى ، گەرەتەرىن دەستكەوتى مروفایەتتە .

دروستبىونى ۋەزارەتى يارمەتى مروفایەتى ۋە مافى مروف ۋە ئازادىي بىرورادەرىپىن ۋە راگەياندىن (ئەگەر چى بە كەمىيە ۋە ھىشتا ھەر بە رېككەوتن ۋە ئىتتىلافىيە) ، سەرەتاي گۆرانكارىيەكى مەزنى كۆمەلايەتى ۋە پىشكەوتنى كوردە ۋە ھەنگاوى لەم جۆرە ھىشتا لە ناوچەكە ۋە دوروپىشتا نەزاوہ . كە بۆ يەكەم جار لە مېژووى گەلەكەماندا دەنگدان كرا ، ئافرەت مافى دەنگدانى ھەبوو ، بەلام لە ھەندىك لە ولاتانى ناوچەكەدا لەگەل ئەوھشدا كە دەيان سالاھ مافى چارەنوسى خۆيان بېيارداوہ ۋە خاوەن پەرلەمان ۋە دەولەت ۋە سامانى خەيالىن ، بەلام ھىشتا ئافرەت مافى دەنگدانى نە .

كورد گەلەكى بەتوانا ۋە پىشكەوتنخاوەن ۋە چاوەروانى گۆرانكارىيە گەرەي لىئەكەرىت ، ئەگەر ئاشتى ۋە دىموكراتىيە ھەبىت .

تېبىنى : لە كاتىكدا گۆقارەكەمان بەرەو چاپ دەچوو ، ھەوالى كارەساتىكى گەرەمان بىست كە لە ھەولتەر روویداوہ ، ئەوئىش پەيوەندىيە بە ناوەرۆكى ئەم وتارەوہ ھەيە ، بۆيە لىرەدا ئامازەي بۆ دەكەين .

تېرۆركردنى كورد ۋەك (كەس) ، كارىكى نوئى نە لە جولانەوہي رزگارخاوەنى گەلەكەماندا ، بەلام تېرۆركردنى ئەندامىكى كۆمىتەي ناوھندىيە گەرە حىزبىكى كوردستان كە ۋەزىر بىت ۋە پارىزگارى پائتەختى ھەرىم بىت ۋە سەرۆكى فراكسىيونى پەرلەمانتارانى حىزبىك بىت... كارەساتىكى گەرەيە .

ناو گرىنگ نە ئەگەر (فرەنسۆ ھەرىرى) نەبووايە ، ئەو يەكىكى تر ئەبوو ، گرىنگ لىرەدا ئەوہيە كە دوژمەنى گەلەكەمان ، بەرامبەر بە ھەر ھەونگاوىكى نىكبوونەوہي لايەنەكان ، ئەوانىش درندەتر دەبن ۋە رىگاي نامروفانەتر دەگرەن بەر... شەھىد كردنى دوو سكرتېرى گىشتىي حىزبى دىموكراتى كوردستانى ئىران ۋە لەو پەرىش (سالج يوسفى) ۋە چەندانى ترىش ، ئەو راستىيە دوويات ئەكەنەوہ كە ئەگەر يەكەيتى ۋە ئاشتى نەبىت لە كوردستاندا ، ئەوا دوژمەن بە ئاسانىي زەفەرمان پىندەبن ۋە كەس ژيانىي مسۆگەر نە! لەبەر ئەو پىويستە ھەنگاوەكانمان بەرەو ئاشتى ۋە يەكخستەوہي ھىزەكانمان خىراتر بەكەين .

سەر بەرزىي ۋە نەمرى بۆ شەھىدان ۋە سەر شۆپىش بۆ دوژمەن ۋە تېرۆرە چەلەكانيان

كوردستان بەگىشتى ۋە باشورىشى بە تايپەتتى ، دەيان سالاھ ئارامىي بە خۆيەوہ نەدوہ . داگىركەران ۋە ناخەزان ھەمىشە لە ھەول ۋە تەقەلاي بەردەوامدا بوون ۋە ئىستاش ھەر بەردەوامن لە پىناوى دروستكردنى كىشە ۋە ئاشوبى ھەمەجۆرە سىياسى ۋە كۆمەلايەتى ۋە ئابورى ... سەدان چۆرى تر ، ھەر بەو ئاواتەي كە ئاشتى ۋە ئارامىي ، ئەگەر لە بىستىكى كوردستانىشدا بىت ، نەيەتەدى .

دوادەھىي سەدەي رابوردو ، وینەيەكى زەقى ئەو ھەول ۋە كۆششە تىكەدەھىي داگىركەران ۋە دوژمەنى گەلەكەمان بوو ، باشورى ولات بوو بە گۆرەپانى بەيەكدادانى چەكدارىي ۋە كوشت ۋە بې ۋە مالىوانىي ۋە سەرگەردانىي دەيان ھەزار رۆلەي گەلەكەمان ۋە پەرەوازيي لە دور لە ناوچە ۋە ھەوارگەي خۆيانەوہ ، بەشبوونى باشور بە چەند ناوچەيەكەوہ ۋە بە كوردەوش بەشبوونى تەواوى دامودەزگا بەرپوہبەرايەتى ۋە كۆمەلايەتى ۋە پىشەيەكان ، بوو ھۆي خاوەردنەوہي رەپوہوہي پىشكەوتنى گەلەكەمان لە تەواوى بوارەكانى ژياندا ، لە كاتىكدا كە جارەن دوژمەن ئەو (دەستكەوتەيان) بە خۆين ئەكەرى ، بەلام لە سالانى كۆتايى سەدەي رابوردو بە خۆرايى ۋە بە بى لوتىژانى سەربازىكيان ، پىلان ۋە مەھىستەكانيان جىبەجى بوو .


ئەمسال .. دواي دووسى سال لە دوخى نە شەپ ۋە نە ئاشتى ، نىكبوونەوہيەكى (گەرم) لە نىوان لايەنە ناكۆكەكاندا كەوتوہتە گەر ، دواچارىش سەردانە چاوەروان نەكراوہكانى سەرۆكى يەكىتى نىشتىمانىي ، بەرىز مام جەلال بوو بۆ پىرمام بۆ لاي سەرۆكى پارتى ، بەرىز مەسعود بارزانىي .

ھەرچەندە تا ئىستاش ۋەك ھەموو جارىكى تر ، رۆن نەبوو تەوہ ئەو سەردانانە چۆن بوو ۋە چى لە چاوپىكەوتنەكاندا باسكراوہ ۋە لەسەر چى رېككەوتون! لەگەل ئەوھشدا كە جەماوەر تا رادەيەك بىزارە ۋە بىباوہپىي لە لا دروستبووہ ، بەلام ئەم نىكبوونەوہيەي دوايى وەي (رۇخاوى) بەرزكردوہ ۋە ھەر بەو شىوہيەش خۆشباوہپىي ھەندىك لە دوژمەنى كەم كوردەوہ ۋە دلى داخورىاندن . تەقاندەوہي دەيان بۆمب لە ھەولتەر ۋە شارەكانى ترى باشورى ولاتدا ، نىشانەي ترسى دوژمەنە لە ئارامىي ۋە ئاشتى ۋە نىكبوونەوہي لايەنەكانى كوردستان لە يەكتر .

مىژووى مروفایەتى بەم رۆزگارە ئەيسەلنىت كە رەپوہوہي پىشكەوتن بەرەو پىشەوہ ناروات ، ئەگەر لە زۇنگاوى شەپ ۋە كىشە چەكدارىي ۋە سىياسىيەكاندا بخولتەوہ ، رەپوہوہي پىشكەوتن ئەبى زەمىنەيەكى ئارامىي ۋە دىموكراتىي ھەبىت . گومان لەوہدا نە تا دوو لايەنە ناكۆكەكە زياتر لە يەكتر نىك بىنەوہ ، بۆمبەقەينەوہ ۋە ھەولدانى ئاشوب ۋە تىكەدەرانەي دوژمەنىش زۆرتەر ئەبىت ، چونكە ئاشتى ۋە تەبايى كورد خۆي لە خۆيدا بۆمبىكى مەزەنە ۋە لە دل ۋە دەرونى دژمەن ئەكەوت . رىگاگرتن لە كۆششە تىكەدەھىيەكانى دوژمەن تەنبا بە يەكەدەنگىي ۋە يەكىتى كۆمەل ئەكەرىت ، بە خستەوہگەرى پەرلەمان

كهيا نيزۆل سەرۆكى فیدراسیۆنى كۆمه‌له كوردستانییه‌كان بۆ هه‌فته‌نامه‌ی گۆلان ده‌دۆی.

فیدراسیۆن ده‌یه‌وۆی ئه‌و ئاوه‌دانکردنه‌وه‌یه‌ی كه له ناوچه‌ی ژێرده‌سه‌لانی
پارتی دیموكراتی كوردستان هه‌یه، هه‌موو كوردستان بگه‌ڕێته‌وه.
فیدراسیۆن تا دوا‌یی پشتیوانی له ده‌سكه‌وتی باشوری كوردستان ده‌كات.



كهيا سه‌بارهت به رۆلی كوردانی
دانیشته‌ووی سوید رایگه‌یاندا:

- كوردی سوید گه‌لیك له خه‌باتی
سیاسی و كۆمه‌لایه‌تی دا ئه‌كتیفن.
كوردی هه‌موو به‌شه‌كانی كوردستان
پێكه‌وه له فیدراسیۆندا كار ده‌كهن.
فیدراسیۆنیش خه‌باتی‌کی قوڵی
كوردانه به‌رپه‌وه ده‌بات و جیگه‌ی
شانازییه كه توانیومه‌انه له رێی
فیدراسیۆنه‌وه خه‌باتی گه‌له‌كه‌مان
زیاتر به‌ره‌و پێشه‌وه به‌رین. سه‌بارهت
به باشوری كوردستان، فیدراسیۆن تا
دوا‌یی پشتیوانی له ده‌سكه‌وتی
باشوری كوردستان ده‌كات و هه‌ول
ده‌ده‌ین جیگه‌ی خۆی بگه‌ڕێ.

رێپۆرتاژ: محهمه‌دی حاجی قادر

دوژمنانمان هه‌ول ده‌ده‌ن
ده‌سكه‌وته‌كانی كورد له‌ناو به‌رن.
جاری‌کی دیکه دووپاتی ده‌كه‌مه‌وه كه
ئێركی ئێمه‌ی كورده كه پشتی ئه‌و
ئهمونه بگه‌ڕین و به هه‌موو لایه‌كه‌مان
هه‌ول به‌ره‌و پێشه‌وه بردنی بده‌ین.
واته ئێركی هه‌موو لایه‌كه‌مان هه‌ول
بده‌ین ئه‌م ستاتیۆ سیاسییه‌ی كه له
كوردستانی باشور هه‌یه، له لایه‌ن
ولاتانی ده‌ره‌وه به‌ره‌سمی بناسرێ و
قبول بكرێ.

هه‌روه‌ها نيزۆل سه‌بارهت به كار و
په‌ڕه‌هه‌كانی هه‌رێمی كوردستان گوتی:

- ئێمه به چاوی خۆمان دیتومه‌انه
كه ناوچه‌كانی ژێرده‌سه‌لانی پارتی
دیموكرات له باشوری كوردستان له
په‌ڕه‌وه‌دانکردنه‌وه، زۆر
به‌ره‌و پێشه‌وه چووه. ئێمه تا دوا‌یی
پشتیوانی له ئاوه‌دانکردنه‌وه‌یه
ده‌كه‌ین و هه‌روه‌ها ده‌خوازین ئه‌و
ئاوه‌دانکردنه‌وه‌یه‌ی كه له ناوچه‌كانی
ژێرده‌سه‌لانی پارتی دیموكرات هه‌یه
هه‌موو كوردستان بگه‌ڕێته‌وه.
هه‌روه‌ها داواكارین هه‌رچی زووتر
هه‌ول بدرێ حكومه‌تی‌کی هاوبه‌ش
دابمه‌زرێ و ئێمه‌ش وه‌كو فیدراسیۆن
تا دوا‌یی پشتیوانی له ده‌كه‌ین.

كهيا نيزۆل به‌م شیوه‌یه بۆ گۆلان
دوا. ئه‌و سه‌ره‌تا ده‌رباره‌ی ستاتیۆ
سیاسی كوردستانی عێراق گوتی:

- ئێمه وه‌ك فیدراسیۆن ئه‌و
ستاتیۆ سیاسییه‌ی كه له باشوری
كوردستان كه‌وتوه‌ته ده‌ست گه‌لی
كوردمان، به هه‌نگاوێکی گه‌رنگ و
باشی ده‌بینین. ئێركی هه‌ر كوردیکه
له هه‌ر پارچه‌یه‌کی كوردستان،
پشتیگیری و پارێزگاری له بکات و
هه‌ول به‌ره‌و پێشه‌وه بردنی بدات.
ئێمه داواكارین هه‌رچی زووتر
هه‌لپه‌ژدانی‌کی گه‌شتی ئه‌نجام بدرێ و
حكومه‌تی‌کی هاوبه‌ش دابمه‌زرێ،
له‌سه‌ر ئامانجی فیدرالیه‌ت بۆ
كوردستان.

نيزۆل ده‌رباره‌ی ئاسته‌هه‌نگه
پێشه‌هاته‌كان له كوردستان رایگه‌یاندا:

- ئاسته‌هه‌نگه‌كان گه‌لیك زۆرن،
به‌لام له به‌ره‌تدا بۆ ئه‌وه ده‌گه‌ڕێنه‌وه
كه ده‌وله‌تانی داگیركه‌ر ناخوازین
ستاتیۆ سیاسی بگه‌وێته
ژێرده‌سه‌لانی كوردان. بۆیه هه‌رچی
له ده‌ستی دوژمنان بێ درێغی ناكهن.
كه‌واته پێویسته ئێمه‌ی كورد باش
تیبگه‌ین كه دوژمنان زۆره و

راگه یاندن

سوید له سه رهتای سالی ٢٠٠١ وه بۆ ماوهی شهش مانگ سه رۆکایه تی یه کیه تی ئه وروپا ده کات. له شهش مانگه دا گه لیک کۆبوونه وهی گرنگ له ناوچه و هه ریمه جیاوازه کانی سویدا پینکدئ. یه کیک له باسه گرنگه کانی ئه و کۆبوونه وانه، بۆ ئیمه ی کورد له سوید و دهره وهی، په یوسته به چاره سه رکردنی کیشه ی گه لی کورد و وه رگرتنی تورکیا به ئه ندامه تی له یه کیه تی ئه وروپادا.

ریکخراوه کوردیه کان له سوید، ئه مرۆ به پرۆگرامیکه هاوبهش هه ول دهن کیشه و داخوازییه کانی گه لی کورد بۆ یه کیه تی ئه وروپا زه ق بکه نه وه. هاوبه یمانه کان بۆ گه یشتن به و مه به سته هه ندیک چالاکیه هاوبه شیان گه لاله کردوه. ئیمه له و باوه ره داین، که سوید ده توانی رۆلێکی گرنگ له گفتوگۆکانی یه کیه تی ئه وروپادا ببینی، له شیوه ی وه رگرتنی تورکیا به ئه ندامه تی یه کیه تی ئه وروپادا.

وه زیری دهره وهی سوید Anna Lind گه لیک جار له کۆبوونه وه کانی یه کیه تی ئه وروپادا ئاماژه ی به پیشیلکردنی مافی مرۆف و ئاماده نه بوونی تورکیا بۆ چاره سه رکردنی کیشه ی کورد له تورکیا کردوه. ئانالیند هه روه ها تیبینییه کانی حکومه تی سویدی ئاراسته ی گه لی سوید و کوردی دانیشتیوی سوید کردوه.

سوید خاوه نی میژوویه کی ده وله منده له بواری پاراستنی مافی مرۆف دا. ئه وهش سروسشتیه که سوید ده توانی له ماوه ی سه رۆکایه تی خۆیدا له یه کیه تی ئه وروپا رۆلێکی پیشه وه ی هه بی. سوید له رابوردووشدا رۆلێکی ئاوا پۆرتیفی له چوارچیه ی نیونه ته وه یی دا هه بووه، وه ک هه ولدان بۆ چاره سه رکردنی کیشه ی ئیتنام، نیکاراگوا، ئه فریقای باشور و فه له ستین دا. ئیستا کاتی ئه وه هاتوه، که سوید هه ربه و شیوه یه هه ولی چاره سه رکردنی ئاشتیانه ی گه لی کورد له تورکیادا بدات و چاره سه رکردنی کیشه ی کورد له به رنامه ی کاری یه کیه تی ئه وروپادا بگونجینی.

ئیمه کورده کانی دانیشتیوی سوید له ده وله تی سویدمان ده وئ که کیشه ی کورد تیکه لی کیشه کانی تری تورکیا نه که ن و ئه و کیشه یه وه ک خۆی که هه یه، به ناوی چاره سه رکردنی کیشه ی گه لی کورد له گه ل تورکیا بخره به ریاس و لیکۆلینه وه و هه ولی چاره سه رکردنی بدن. کوردی سوید له ماوه ی سه رۆکایه تی سوید له یه کیه تی ئه وروپادا، سه رکه وتنی سویدی له بواره جیاوازه کاندان ئاواته و هه روه ها هیواداره که له و ماوه یه دا گه لیک بریاری گرنگ بدریت. هه روه ها ئیمه داوا له حکومه تی سوید و هیزه دیموکراتیه کانی سوید ده که ین که به وردیه هه ولی پاراستنی مافی مرۆف بدن.

به به شدار بوونتان له خۆپیشاندانی کورده کانی سوید له رۆژی کۆبوونه وه ی یه کیه تی ئه وروپادا پستی گه لی کورد بگرن.

میژوو : شهمه 2001/3/24

کات : 13,00 - 14,30

شوین : Huvudingång Älvsjö mässan

فیدراسیۆنی کۆمه له کوردستانیه کان له سوید

کۆمیته ی هاوکاریی هیزه سیاسیه کانی کورد و کوردستانی له سوید

ئینسیاتیفا کورد له سوید IKS

بۆ وه رگرتنی ئاگاداریی پتر په یوه ندی به فیدراسیۆنه وه بکه ن یان

بروانه لاپه ره ی فیدراسیۆن له www.kurdiskaarf.org

بۆ ماریتا اولفسکۆگ وەزیری کۆلتوری سوید

فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید سوپاسی ھاوکاری بەرپزتان دەکات بۆ دانانی پرۆگرامی کوردیی لە رادیۆی سویددا. دواى خەباتىكى دور و درىژ لهگهڵ سیاسى کاران و سەرۆكى رادیۆى ناوهندی سوید، توانیمان بە ئاکامىكى باش بگهین. ھیوادارین بەرە بەرە بەشى کوردیی رادیۆی سوید بتوانن بەرنامەکانی بەشیۆهێ رۆژانە بلۆ بکاتەوه، ئەوه ههنگاویكى گهلیک بە نرخه که رادیۆی سوید، بەشى کوردیی کردووه و بە زمانى کوردیی پرۆگرام بلۆ دەکاتەوه. ههروهها ئەوه نمونەیهكى باشه بۆ ئەو دەولهتانهى که تا ئیستا دهرهتانیكى وایان بۆ کوردی ولاتهکهیان داوین نەکردووه.

کۆمەلگای کورد لە سوید بایهخىكى گرنهگ دەدات بەو ههنگاوهتان و ئیتمه جارىكى تریش لەم بوارهدا سوپاس و پشتگیری خۆمانتان بۆ دهرهبرین و سوپاسی پشتگیریستان ئەکەین لە مافی مرقایهتی گهلی کوردمان.

بە سلاوی برایانهمان کهیا ئیزۆل
سەرۆکی فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید
۲۰۰۱/۱/۹

بۆ بەرێز کاک مەسعود بارزانی سەرۆکی پارتی دیموکراتی کوردستان

ههواتی تیرۆرکردنی تیکۆشهری ماندوویی نهاس کاک فرهنسق ههريبی ئەندامی کۆمیتەى ناوهندی پارتی دیموکراتی کوردستان و ئەندامی پەرلهمانی کوردستانمان پینگهیشت، بەدهستی دوژمنانی گهله ستهمدیدهکهمان و ئاساییش و ئاشتی و ئەزمونهکهی.

فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید بە توندی ئەم تاوانه چهپهله ریسوا دهکات و به داخ و پهژارهیهکی زۆریشهوه سهرخۆشی له بهرپزتان دهکات و ههروهها له بنهمالهى خوالیخۆشبوو، ئەندامان و لایهنگرانی پارتی دیموکراتی کوردستان و پەرلهمانی کوردستان و دۆست و ئاشنایانی.

ھیوادارین بە زووترین کات تیرۆریستهکان دەستگیر بکړین و بە سزای پهلوی خویان بگن و شهرمهزار ریسواى گهلی کورد و ئاشوری ببن.

بە سلاوی برایانهمان کهیا ئیزۆل
سەرۆکی فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید
۲۰۰۱/۲/۱۹

بۆ کۆنگرهى لاوانى پارتى چهپى سوید

فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان سوپاسی بانگهێشتنهکهتان دهکات و سهرکهوتنی کۆنگرهکهتان ئاواته دهخوازه. ئیتمه بایهخىكى زۆر دهدهین به ههولدانى ئیوه بۆ چارهسهر کردنی کیشهه کورد له تورکیادا، بۆ راکیشانی رای گشتی لهو ماوهیهدا که سوید سهرۆکایهتی یهکیهتی ئهوروپا دهکات، ئیتمهش چهپه چالاکیهک بهرپوه دهبین.

تورکیا که بۆ ئەندامهتی له یهکیهتی ئهوروپادا پالتیرواه، ئەمرۆ له ههلوهرجیكى زۆر نالهباری سیاسی دا دهژی، ئەوانهه دهولهتی تورکیا بهرپوه دهبن، رۆژ نیه مافی مرقف پشیل نهکن. مافی ههزاران بهندی سیاسی پشیل دهکری. لهوه دهچی، هیزی تاییهتی ولات له بهرامبهر بهنده سیاسییهکاندا شهری راگهیانندی. مانگرتنی سیاسی تامردن هیشتا له زیندانی FTYP بهردهوامه. هیرش بردنه سهر کهسوکاری زیندانییه سیاسییهکان و گرتن و راوانیان به شیوهی نپساوه درێژهی ههیه.

مافی نهتهوايهتی گهلی کورد به ههموو شیوهیهک پشیل دهکری. زمانى کوردی که پتر له سى میلیون کهس له دنیادا قسهی پندهکهن، ئەمرۆ له تورکیا یاساخه. ئەوه تاوانی پریمی سهربازی تورکیا و شهرمهزاری کۆمهلگای مرققایهتی ئەم سهردهمهى جیهانه. ئیتمه لهو داخوازییهی ئیوه خۆشحالین، که دهلین ههتا تورکیا کوتایی به زولم و ستهم نههینى بهرامبهر گهلی کورد، به ئەندامهتی یهکیهتی ئهوروپا وهرنهگیرى. ههروهها ئیتمه دهمانهوی ئاماژه بهو راستییه بکهین، که کیشهه کورد تهنیا زمان و کولتور ناگریتهوه، بهلکوو دهبی وهک ههموو نهتهوهکانی سهرزهوی، بۆخوی مافی چارهنوسی خوی دیاریی بکات.

مافهکانی مرقف ئەمرۆ زۆر به جیدی له تورکیا پشیل دهکری. پارتی فاشی MHP ی هاوبهش له بهرپوهبردنی حکومهتی تورکیادا، نمونهی پارتی Haidar ی ئوتریشه. ههچهنده ئوتریش ئەندامه له یهکیهتی ئهوروپادا، ئەندامانی یهکیهتی ئهوروپا به ههموو شیوهیهک درى راوهستان، بهلام بۆ تورکیا که تا ئیستا به ئەندام وهرنهگیراوه، ئهوروپا بیدهنگ مایهوه. ئەمهش پشتگیرییهکی مەزن بوو بۆ تورکیا، که له جیهان بهدهستی هینا.

ههولدانى گهلی کورد پیوستی به پشتگیری پتره. ئیتمه باش دهزانین که ههستی هاوکاری کردن لهگهڵ گهلی کورد بۆ چارهسهرکردنی کیشهکهی له سوید له پلهیهکی بهرز دایهوه ههولی لاوانی پارتی چهپی سویدیش لهو ههستهوه سهرچاوه دهکری. فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید جارێکی تریش سهرکهوتنی کۆنگرهکهتانی ئاواته.

بە سوپاسی فراوانهوه
کهیا ئیزۆل
سەرۆکی فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانییهکان لە سوید
۲۰۰۱/۲/۱۹

فیدراسیۆنی کۆمهله کوردستانییهکان له سوید له گهه کۆمیتهی
هاوکاری هیزه سیاسییهکانی کورد و کوردستانی له سوید و ئینسیاتیقا
کورد له سوید

پۆزی شههمه 2001/3/24 پۆزی کۆبوونهوهی یهکیهتی ئهوروپا له سوید خۆپیشاندانیک
رێکدهخن. به بهشدار بوونتان له خۆپیشاندانهدا، پشتی گهلی کورد بگرن.

میژوو : شههمه 2001/3/24

کات : 13,00 - 14,30

شوین : Huvudingång Älvsjö mässan

بۆ وهرگرنتی ئاگاداریی پتر پهیهوهندی به فیدراسیۆنهوه بکهن یان
بروانه لاپههه فیدراسیۆن له www.kurdiskaarf.org

یادی کارهساتی ههلهبجه لهبیر مهکهن !

میژوو : ههینی 2001/3/16

کات : 17,00

شوین : Adolf Fredriks Kyrka Stockholm

فیدراسیۆنی کۆمهله کوردستانییهکان

جهزنی نهوڕۆز و سالی 2701 ی کوردیتان لی پیرۆز بی

میژوو : ههینی 2001/3/24

کات : 18,00

شوین : ستۆکهۆلم : Solnahallen Stockholm

فیدراسیۆنی کۆمهله کوردستانییهکان

بەربانگ

ژمارە ١١٩ سالی ١٩ (٢٠٠١)

نۆزگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییهکانە لە سوید
خاوەن نێمیازی: کەیا نێزۆل

دەستە نوسەرانی:

ھامید گەوھەری

نەوزاد وەلی

نەزەر قەرەھان

فارس

کۆشان نامەدی

مونتاز

ھامیدی گەوھەری

بەریۆدبەری نێداری: نەزەر قەرەھان

نابوونە سائەنە: ١٠٠ کرۆنی سویدییه

بۆ دەزگاکان: ٢٠٠ کرۆنی سویدییه

نرخە یەک دانە: ٢٥ کرۆنی سویدییه

بۆ دەرەوێ سوید: ٤٠ دۆلاری ئەمریکی

بۆ دەزگاکانی دەرەوێ سوید: ٦٠ دۆلاری ئەمریکی

ناونیشان:

e-mail

berbang@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

Box 490 90 Stockholm

Tel: 08- 644 66 22

Fax: 08- 650 21 20

پۆستگێڕۆ: 8- 64 38 80

دەستە نوسەرانی مانی ئەوێ ھەمە ، رێنوسی وتارەکان راست

بکاتەو و بەو نێوئەوێ دەگۆنن ، کورنیان بکاتەو .

دەستە نوسەرانی لە ناوەرۆکی وتارەکان بەرپرسان نێ

فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییهکان لە سوید لە

١٩٨١/٦/٦ دامەزرێوە .

ژمارە یەكەمی بەربانگ لە مانگی ٧/١٩٨٢ ١٥ بۆکرێوەتەو

ناوەرۆک

- ١ - چەند ئاگادارییهک
- ٢ - نامە بۆ بەرپز کاک مەسعود بارزانی
- ٢ - نامە بۆ کۆنگرەیی لاوانی پارتنی چەپی سوید
- ٣ - راگەیاندن
- ٤ - کەیا نێزۆل بۆ ھەفتەنامەیی گۆلان دەوێ
- ٥ - ئاشتیی و بۆمب
- ٦ - گفتوگۆی شارستانییهتە جیاوازەکان .. ھامید گەوھەر ..
- ٧ - تیرۆر گەلی کورد ناترسینن
- ٨ - زمان
- ١٠ - پاشخانیکیی پەلکەزێرینە
- ١٤ - خۆنەری شیعر و رەخنەیی
- ١٦ - شەبەق
- ١٧ - کۆرپیکیی ماتەمینی بۆ مەحمود باکسی
- ١٨ - چەند گروپی جیاواز سەردانی فیدراسیۆنیان کرد
- ١٩ - یارمەتی ئێو بۆ چاککردنەوێ قەلای ھولیر گەیشت ..
- ٢٠ - چەند چالاکییهکی فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی
- ٢٢ - بەربانگ و خۆنەران
- ٢٢ - چاپکراوی نوێ

بۆ پەيوەندیی لەگەڵ فیدراسیۆن

بروانە لاپەرەکانی فیدراسیۆن لە

ئەنتەرنێتدا

e-mail

berbang@kurdiskarf.org

www.kurdiskarf.org

بەرپانگ

ئۈرگەنى فېدراسىيۈنى كۆمەلە كوردستانىيەكانە لە سوېد
زمارە ۱۱۹ سانى ۲۰۰۱

بىستەمىن سانى دامەزانى فېدراسىيۈنى كۆمەلە
كوردستانىيەكان پىرۈز بى